



**150****SAL: 3****12-18 berfanbar (Arabik) 1998****BUHA (Flat) : 200.000 TL**

Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan

**“Ez têk  
necûm lewma  
pasaporta min  
nîn e”**





SAMİ TAN

Vê demê helwesta karkerên tirk û rôexistinê wan girîng e. Heke ew li nik gelê kurd cih bigirin dê kefa mêtzinê ya çareseriye jî girantir bikin. Heke na, dê digel gelê kurd, xesareke mezin bigihêje wan jî.

**P**işti çûna Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo İtalyayê dewleta tirk ketiye nava tengasiyeke mezin. Çend rojên pêşin rayedaren dewleta tirk wekî meyxuran sermest bûbûn. Wekî her carê serkeftineke psikolojik hatibû daxuyandin. Çapemeniya tirk li ser bilançoya şer a 15 salan nivîs dinivîsandin. Lê pişti demekê ku bi diyarbûna helwesta İtalyayê û Ewrûpayê vê sermestiyê cihê xwe da dîn û hariyê. Li hemberî kurdên welatparêz û dewleta itâlî komikên faşist û nijadperest rabûn ser piyan. Komikên faşist li nik hêzên dewletê berê xwe dan saziyên kurdan û di hezaran kurd digel hewlê lînçkirinê yên faşistan hatin derdestkirin, bi sedan kes bi helwesteke siyasi hatin girtin. Ji 12'yê sermawezê vir de bi sedan kes hatine girtin û niha di girtigehê de ne. Di van bûyeran de du kesan jiyana xwe ji dest da. Di nav kesen ku beramberî êrîşan man de çend xebatkarê rojnameya me jî hene. Ev êrîş hê jî didomin.

Li gorî hefteya din ne sermestiya serkeftinê ne jî, hêrs û gira li hemberî

İtalyayê maye. Êdî rejîperest ketine nava tirs û saweke mezin. Lewre bi PKK'ê an jî bêyî PKK'ê (!) hemû dewleten mezin çareseriya kêseya kurd dixwazin. Êdî her kes dibîne ku li ber çareseriye bi tenê astengiyek heye, ew jî dewleta tirk. Lewre jî her kes li riya qanî Tirkiyeyê digere.

Hinek dixwazin bi nermî di ber dilê wê re herin û wisa wê qanî bikin. Hinek jî didin zanîn ku bi vî awayî nikarin Tirkiyeyê ji riya şerperestiyê vegeerin, lewre jî divê her kes bi tundî bi ser vê dewletê de here. Kesen ku dîtina duyemîn diparêzin balê dikişin tecrûbeya salan û rewşa pişti pejirandina Tirkiyeye bo nava Yekîtiya. Gumrukê û bi bîr dixin ku pişti ku rayedaren tirk gihîstîn doz û armâncâ xwe her tişti jî bîr kirine. Bi şeweyekî tûjtir cûne ser derdorê aştîkwaz û demokrat.

Di nav kesen rejîperest de jî dubendiyekê xwe daye der. Birek ji wan dixwazin ku li hemberî Ewrûpayê helwesteke tûjtir bigire û bi tu awayî gava xwe bi paş de neavêje. MGK'ê helwesta xwe li nik vê dîtina tundraw diyar kiriye. Ev yek ji gotinê generalan ên bi rengê

"Bi kurdî weşana televîzyonê nabe." û gotinê hinek berdevkêñ rejmî yê bi rengê "Ewrûpa dixwaze Peymana Sewrê bi me bide pejirandin." diyar dibe. Lewre jî xwediyê vê dîtinê niha serdest xuya dikan.

Lê kesen ku li dijî vê dîtinê radibin jî hene. Hinek kesen din jî li dijî vê ramanê derdi Kevin. Ew kes dibînin ku Tirkîye bi tenê dimîne û ji dînyayê tecrîdîbe. Lewre jî xwediyê vê bîr û ramanê dixwazin ku hin gavên biçuk bîn avetin. Bo iro desthilatdarêñ tirk dûrî çareseriye xuya dikan, hêdî hêdî ew jî dikevin bin bandora nîqaşen çareseriye.

Rejîm ne tenê ji ber kêseya kurdî her wiha ji ber qeyrana aborî jî ketiye nava tîrseke mezin. Niha karsazên tirk qala derxistina bi hezaran karkeran dikan. Li vê derê helwesta karkeren tirk û rôexistinê wan girîng e. Heke helwesteke rast û durist diyar bikin û li nik gelê kurd cihê xwe bigirin dê ew jî bi ser bikevin û dê kefa mêtzinê ya çareseriye jî girantir bikin. Lê heke ev yek pêk neyê dê digel gelê kurd, xesareke mezin bigihêje wan jî.

# Li ber çavêñ dinyayê rûresiyeke din

## Ferhengok

**aflînegîr:** bêteref  
**arizîldîrin:** özelleştirme  
**berfemot:** berfemids  
**berfso:** silope  
**bername:** program  
**cawanî:** nitelik  
**cendîni:** nicelek  
**dab û nêrit:** orf û adet  
**dabînîrin:** mis-ogerkerin  
**dad:** adalet  
**debeng:** ehmeq  
**derbirîn:** ifadekirin  
**dîl:** esîr  
**dîmen:** manzara, görüntü  
**diyarde:** olgu  
**ezperest:** bencil  
**gerdûnî:** cihanî  
**gotar:** maqale, nutuq  
**gotûbêj:** nîqaş  
**hemîse:** her tim  
**hevdîl:** yürekdaş  
**hevraman:** düşunce-daş  
**hismedî:** bilinc  
**kêse:** problem  
**kîtekît:** detay  
**lêguncîn:** lêhatin  
**mêsîl:** çirav, pengav

**metîrsî:** xem, endişe  
**naverok:** içerik  
**navgîn:** amûr, hacet  
**neguherbar:** değişim  
**nijadperest:** regezperest (ırkçı)  
**nûrkirin:** qatkîrin  
**pandake:** loda pêçayî ya giyanan  
**pêgeh:** alan, kapsam  
**pêşdarazî:** önyargı  
**pîsteplî:** birlik ve beraberlik  
**pûrkirin:** qesartın, spîkirin  
**ragîhandîn:** iletmek, bildirmek  
**rêbaz:** metod  
**serdem:** heyam  
**serwexîbûn:** uyanık olmak  
**sîrûşî:** xwezayî, tabî  
**sayesandin:** taswîirkirin  
**şewe:** awa, teşe (biçim)  
**tomargeh:** stûdyo  
**veşevîtin:** arın  
**weşan:** yayın  
**weşangerî:** yayincılık  
**xizan:** hejar, fecîr

Î.CAN DILBIRÎN

**V**an rojên dawîn li Ewrûpayê der barê pirsgirêka kurdî de, hinek gotûbêj çebûn. Ji wan a herî girîng hevdîtina di navbera serokwezîren Almanya û İtalyayê ya ku li Bonnê pêk hat, bû. Rayedaren dewleta tirk bi vê yekê geleki aciz bûn. Gotin, diviya Almanyayê Apo biriba û paşê jî, teslimî me bîkira. Yanê xelkê wekî xwe dihesibînin. Rûresen ku heta duh ji bo xwe têxin kirâsê xelkê, qunfiskî dikirin. Iro jî bi wan xeftanen ku li xwe kirine dixwazin mirovahiyê bixapînîn. Ma heta niha serokên kurdan hatibûn û bi milyonan gel ew pêşwazî kiribûn? Na. Lê ne hûn bûn. Duh digot em ê ji bo rizgariya Çeçenîstanê li Parîs, Bonn û tevâhiya Ewrûpayê meşan pêk bînîn. Cîma li Çeçenîstanê li gorî gotina wan tevkujî pêk dihatin? Dema derketin, herkesi rûresi û şesmeriya wan bi çavêñ xwe dît. Hin derketibûn digotin 'ji kurdan re mirin.' Belê wehseta ku li ser Kurdistanê dimeşînin ne bes e dixwazin li Ewrûpayê jî kurdan biçewşînin. Eger mirov rastiyê bibêje wan hinek welatên wekî Almanya û Frensa bi şantajan xapandin. Almanyayê di 26'ê sermawezâ 1993'yan de li ser gîlî û şantajen Tirkiyeyê tevge-

ra kurd û rengên kurdan li welatê xwe qedexe kîrin. Li Frensayê li dijî kurdan êrîşen ne demokratik pêk anîn.

Her wiha li Swîsreyê Kurdistaniyan meşek pêk anî. Ji balyozxaneya Tirkiyeyê polisên tirk gel gulebaran kir û ciwanekî kurd kuşt. Dema em li şantajen wan dinêrin li hinek deveran heta van demen dawîn bi ser ketine. Di dema hatina Serokê PKK'ê Ab-

Di dema hatina Öcalan a ji bo Romayê de şove nîstiya wan derket asta herî bilind. Ji ber ku ciwanen kurd du şeqem avâtibûn rojnamegeren wan, qiyamet rakirin. Lê ew her roj rojnamegeren kurd digirin û bi işkenceyan dikujin.

dullah Öcalan ya ji bo Romayê de şovenîstiya wan derket asta herî bilind. Ji ber ku çar ciwanen kurd du şeqem avâtibûn rojnamegeren wan, qiyamet rakirin. Lê ew her roj rojnamegeren kurd digirin û bi işkenceyan dikujin. Li hin deveran bi ser HADEP'ê de girtin, li her kesi işkence kîrin. Di dawaye de du kurd ji ber işkenceyên wan mirin.

Şovenîstiya wan bi van mînakân gelekî baş eşkere bû. Li aliye kîkratîn xwe şewitandin, fêkiyên xwe rêtin û hincirandin. Cîma? Digotin

bîhna İtalyayê jê tê. Sedema vê dijiminatiyê ci bû û kê ev gel anî kire na-va vê rewşa êrîşker û şovenîst? Yênu ku digotin em ê Romayê serobinê hev bikin, yênu ku digotin me Sûriye çav-


tîsanî kir dor li İtalyayê ye. Belê her kîlî di weşanen şovenîst de bang li tirkan dikirin û digotin: "Kurdan Ewrûpa rakir ser piyan, bi deh hezaran ber bi Romayê ve diçin, hûn li ku ne?" Diyar dibû ku bi van go-tilan wan dixwest ci bike? Pişti vê, êrîşen hov dest pê kîrin. Saziyên kurdan hatin şewitandin, komaleya Asûrî-Sûryaniyan hate şewitandin û rûxandin.

Li Dêrsim, Gelyê Zilan, A-girî, Newala Qeseban bi mil-yonan kurd hatin kuştin, ev jî wan re ma. Ev ne terofisti ye, lê ci ye? Serokomarê tirk Süleyman Demirel dibêje, em ê dest bi tevkujîyan bikin. Ma me rûyê wan nas nekiriye. Em ê ji İsmet İnönü he-tanî Süleyman Demirel dozdarîn wan in. Bila dinya dadgehan der barê ho-nas û xwînmijan de veke. Ez bang li hemî dayikên me jî dikim. Bila li mîrkujîn ku zarokên wan kuştine û dane kuştin, biggerin. Divê ji iro pê ve hemû mirovîn ku nasen wan hatine kuştin, gund û warêñ wan hatine şewitandin û welatê wan hatiye dagirkirin li faîlîn wan biggerin. Dayikno! roj hatiye zarokên xwe ji bîr nekin.

# Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan: EZ TÊK NEÇÜM LEWMA PASAPORTA MIN NÎN E

Piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan çû Romayê keshaya kurd di navbera hefteyekê de sê caran kete rojeva Yekîtiya Ewrûpayê. Roja 7'ê meha berfanbarê wezîrên karêne derve yên Yekîtiya Ewrûpayê li hev civiyan û bo çareseriya keshaya kurd bîryara lidarxistina konferansa kurd hate girtin. Di heman rojê de Öcalan jî li Romayê derkete pêşberî çapemeniya cihanê û civîneke çapemeniyê li dar xist. Öcalan di daxuyaniya xwe de bi taybetî xwe spasdarê D'Alema dît û ji bo mîvanperweriya gelê İtali dilxwesiya xwe anî zimên. Öcalan dîsa bi taybetî diyar kir ku divê her kes li ber hatina kurdan a Romayê rîzgir be. Her wiha Öcalan da xuyakirin ku ew hêvidar e û dê ew hêvî bi avê de jî neçe.

Di heman roja hevdîtinê de Ö. Politikayê bi Öcalan re hevpeyvînek pêk anî. Serokê Giştî yê PKK'ê, di hevpeyvînê de dide zanîn ku gelek kesan der barê wan de tiştîn erêni û neyînî gotine. Wî bo zelaliya meseleyê da xuyakirin ku divê her kes baş li çalakiyên xweşewitandin, bombekirin û xwepêşandan bikole. Li gorî Öcalan a herî girîng fikirîna keshayê di çarçoveya mafê gelan de ye. Ji aliye din ve Öcalan di hevpeyvînê de di warê dayina statûya siyasi de gîlî û gazincen xwe ji Ewrûpayê dike û dide zanîn ku Ewrûpa mafê penaberiyê dide kurdan, dema ew wekî mirovekî kurd vî mafî dixwaze cîma problemen politîk derdike-



Rojnamegerê kurd M. Şah Yıldız di rapora dewletê de wekî kuştî hate nîşandayîn.

vin. Öcalan li ser vê mijarê ew dîtin derpêş kirin: "Kurdê li Ewrûpayê jîx-weber mafê penaberiyê distinîn. Pasaporta hemû serokên rîxistinê kurdan heye, lê ya min tuneye. Çima? Ji ber ku ez têk neçûme. Ji ber têkneçûyînê ez têm ta-wanbarkirin. Ez hêvidar im ku dê hiqûq van tiştan bibîne û li gorî van mercan bir-yara xwe bide."

## Dewleta tirk Peymana Lozanê jî binpê kir

Öcalan di hevpeyvînê de balê dikişine ser jenosida li ser kurdan û dadixuyîne ku

Öcalan bal kişande ser Giladyo û da zanîn ku ew di bin sîwana DYAYê de ye. Li gorî Öcalan, Abdullah Çatlı di bin sîwana DYAYê de du caran çûye Floridayê. Dîsa M. Ali Ağca ne mirovekî bi serê xwe tevgeriyaye. Öcalan, diyarkir ku tiliya dewleta tirk û DYAY di kuştina Olof Palme de heye.

heke komîsyoneke lêgerîne ya navnete-veyî biçe Kurdistanê wê jenosida li ser çand, ziman, dîrok û nasnameya kurd bê dîtin. Öcalan di axaftina xwe de li ser Lozanê jî radiweste û wiha dibêje: "Demirel dibêje Ewrûpa dixwaze Peymana Sewrê ji nû ve bixe rojevê. Na ne wisa ye, Ewrûpa li ser Lozanê disekine, her çiqas ev 75 sal in ku Lozan tê binpêkirin jî dîsa Ewrûpa destekê dide wê. Wekî mînak mafê hindikahîyan hatine tunekirin. Tirk û kurd di Lozanê de xwedî heman mafan bûn. Lî iro hebûna kurdan tê înkarkirin. Ji ber wê yekê min bi awayekî leşkerî, siyasî û bîrdozî serî hilda." Öcalan da zanîn ku li Ewrûpayê pêşin yekîtiya nete-veyî, demokrasî û mafê mirovan hatin sazkirin û, dûre Yekîtiya Ewrûpayê hate damezirandin. Ew jî dixwaze li welatê xwe wê yekê pêk bîne. Wî da zanîn ku eger di vê de sîcek hebe ew jî wî sûcî dîke. Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan di berdewama axaftina xwe de da zanîn ku, li Ewrûpayê gelê herî kêm îzlandî ne. Lî gelekî wekî kurdan wisa mezin, çîma ji mafan bêpar dimîne. Wî diyar kir ku ew di dîrokê de gelê herî dîrîn e. Ji aliye din ve Öcalan bo Ewrûpayê jî got ku, divê di zûtîrîn katê de bîryarênu ku girtine bînin cih. Bila Tîriye nêzîkî peymanê bibe.

## DYAY kurdan berî hev dide

Öcalan daxuyakirin ku eger problema serokatiyê hebe ew dikarin li ser wê jî li hev bikin. Öcalan di hevpeyvînê de li ser komployan jî radiweste û wiha dibêje: "Heta hewlîn komployê rabin bila min serbest berdin. Ez ê mafê penaberiyê jî nexwazim. Bila ewlekarî bê pêkanîn bes e. Ev li welatekî din jî çêdibe. Lî ji bo ku li ser gelê min komplot bê pêkanîn ez nabim hacet û tu caran xwe teslim nakim. Ez siya komloyê jî nêzîkî xwe nakim. Ji ber ku wê iradeya gelê min were dîl girtin. Gelê min ev yek dît bi meş û çalakiyên xwe şewitandinê bersiv da. Tiştî ku ez bikim wê ji çalakiya gelê min ne cuda be. Bila her kes bizanibe ku ji dîvela teslimiyetê ez ê çalakiya qehremaniyyê tercîh bikim." Öcalan li ser politikaya DYAYê rawestiya û daxuyakirin ku dewleta Amerîka kurdan bi hev dide kuştin. Wî da zanîn ku DYAY dikare biçe Ko-ssovayê, Filistînê û başûrê Kurdistanê, lê bo wî bîryara infazê dide. Li gorî Öcalan berî vêga Arafat ji aliye DYAYê ve wekî terorist dihate binavkirin lê iro DYAY krediyan dide Arafat, Talabanî û Barzanî.

## Gladyo û DYAY

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öca-



lan di berdewama axaftina xwe de bal kişande ser Giladyo û da zanîn ku Giladyo di bin sîwana DYAYê de ye. Li gorî Öcalan, Abdullah Çatlı ku kujer e û eroînfiroşî dikir di bin sîwana DYAYê de du caran çûye Floridayê. Dîsa M. Ali Ağca ku li dijî Papa suikastek pêk anî, ne mirovekî bi serê xwe ye. Öcalan, kuştina Olof Palme wekî çalakiya herî mezin a Gilad-oyê bi nav kir û da zanîn ku tiliya dewleta tirk û DYAY di wê çalakiyê de heye. Öcalan wiha berdewam kir: "Ew ên ku van karan dikin wekî terorist nayê dîtin, lê ez wekî terorist têm binavkirin. Ew nikarin çalakiyeke min li derveyî Kurdistanê destnîşan bidin, ji ber ku nîn e." Öcalan da zanîn yên ku şer didominin dikarin aştiyê jî pêk bînin. Divê li dijî şentajen dewleta tirk Ewrûpa helwestê bigire.

## Ez ne mirî me sax im

Berî vêga jî Serokê Giştî yê PKK'ê çêlî komployan kiribû û dabû zanîn ku ew komplot dê dîsa li dewleta tirk vegerin. Piştî vê daxuyaniya Öcalan dewleta tirk dosyayek amade kir û şande italyayê. Dewleta tirk di dosyayê de kesen ku sax in wekî mirî nîşan dane. Dewleta tirk dixwaze bi vê dosyayê berpirsiya hemû kesen ku ji aliye kontrayan ve hatibûn kuştin bavêje ser PKK'ê. Mînakeke berbiçav nûçegihanê Ö. Gündemê yê Batmanê M. Şah Yıldız bû. Niha jî sax e lê di dosyayê de hatiye gotin ku ew ji aliye PKK'ê ve hatiye kuştin. Béguman ne ew tenê. Cevdet Birkay jî ku hevalê M. Şah Yıldız e di dosyayê de wekî kuştiyê bi

destê PKK'ê hatiye nîşandayin. Lî Birkan jî di sala 1996'an de di qezayekê trafikê de jiyana xwe ji dest daye. Li ser vê yekê me xwe gihande Rojnameger M. Şah Yıldız, Yıldız jî di vî warî de metelmayîna xwe tîne zimên û dadixuyîne ku, jixwe li Tîriye mirin bûye tiştîki ji rezê.

Yıldız da zanîn ku ev rapor têkiliya dewletê ya bi çeteyan re gelekî bas dide der. Her wiha ligorî Yıldız ev yek bêrêz û rîçikbûna vî şerî kirêt dide nîşan. Ji aliye din ve Yıldız da zanîn ku di destê dewletê de liste gelek in lewre ew liste tevlîhev bûne. Wî da xuyakirin ku tîmîn infazî çalakiyên xwe pêk tînîn û raporê didin fermandarêne xwe. Rojnamegerê kurd Yıldız, diyar kir ku, Nûnergeha Batmanê ya Ö. Gündemê hatiye bombekirin ew ji bi tesadûfi li wir bûye. Lî ne ew mi-riye. Yıldız axaftina xwe wiha domand: "Lî em wekî mirî xistine listeyê. Jixwe listeya kesen ku dê werin kuştin berî çalakiyê tê amadekirin. Ez bawer im ew liste çûye italyayê."

Yıldız wekî dawî jî wiha got: "Qaşo em ji aliye PKK'ê ve hatiye kuştin. Ez ê dozê li dijî dewletê û rojnameya İtali ya ku der barê kuştina me de nûçê çekir ve-kim. Di raporê de çîma behsa gundênu ku hatiye şewitandin nayê kirin? Çîma behsa gerîlayen ku hatiye kuştin nakin? Eger bixwazin raporeke objektif binivisin, bila komîsyoneke lêgerîne ya navnete-veyî bê û bi mirovan re biaxive."

Hingî wê diyar bibe ku ji aliye hiqûqi ve kî tawanbarê vî şerî bêrêzûrêcik e."

*Jiyanekî li dijî dagirkeryê JEAN PAUL SARTRE*

# Em tev kujer in

**N**ûnerê egzistansyalîzmê (felsefeye ku li ser rûyê dînayê hebûna mirov bingeh digire û diparâze) yê herî mezin J.P.Sartre bi pirtûka xwe ya bi navê "Hebûn û nebûn" û di vî warî de gaveke girîng avêt. Sartre bi jiyan, berhem, fîkr û ramanê xwe, di nav rewşenbir û filozofen cîhanê de cihekî girîng digire. Bi taybetî jî jiyan û nasnamaya wî ya ronakbîriyê hêjayî lekolînen berfireh e.

Zanyarê navdar J.P.Sartre bi helwesta xwe ya li dijî dagirkerya

Rewşenbîrê frensî  
Sartre xebatê xwe  
yên li dijî dagirkerya  
Frenseyê wekî  
piştgiriya gelê Cezayîr  
û Frenseyê dibîne.  
Sartre li ser vê mijarê  
wiha dibêje: "Heta  
gelê bindest azad  
nebin, gelê ku wekî  
serdest xuya dîkin  
azad nabin."

Frenseyê ya li ser Cezayîrê, bala raya giştî, rewşenbir, çepgirê frensî û yên cîhanê kişand ser da-girkerya Frenseyê.

## Dagirkêri pergalek

Sartre dagirkêri bi awayekî zanistî nirxandiye. Li gorî wî dagirkêri sistemek e, ne hewldaneke şexsî û ne jî encama listikêna rasthatinî ye. Şertî yekem ê mirovahiyê ev e ku mirov xwe ji piştgiriya serdest û dagirkiran bide alî. Rewşenbîrê frensî Sartre xebatê xwe yên li dijî dakirkerya Frenseyê wekî piştgiriya gelê Cezayîr û Frenseyê dibîne. Sartre li ser vê mijarê wiha dibêje: "Heta gelê bindest azad nebin, gelê ku wekî serdest xuya dibin, azad nabin." Li gorî Sartre gava herî mezin û berbiçav rasterast piştgiriya FLN (Eniya Rizgariya Cezayîrê) ye.

Helwesta Sartre ya li dijî dagirkerya Frenseyê li ser sê hêmanê bingehîn berbiçav dibe: Yek, rexnekirina nijadperestiya desthilatdarî û çapemeniya Frenseyê. Du, kişandina bala raya giştî, sê, rexnekirina bêdengiya rewşenbir û çepgirê Frense û cîhanê.

Li Cezayîrê Cezayîriyan qetil dike; ziman û çanda wan asimile dike; çapemeniya frensî vê yekê rewa dibîne û Cezayîriyan jî wekî frensiyê misilman dibîne."

## Dagirkêri nikarin min tawanbar bikin

J.P.Sartre tu êrîş, çewsandin nepejîrandin. Ji aliye Dodgeha Leşkerî ya Frenseyê ve ew wekî xayîn hate flanki-



Sartre pêşî ji xwe dest pê kir. Di wê demê de ji hemî kovar, rojname û weşanan re nivîs şandin. Lî dengê wî bi awayekî xurt nehate bihîstin. Bi dû wê re bi xwe kovarek derxist. Bi xwe rojname û kovarênu ku li dijî serdestan bûn li kolanan firotin. Gelek nivîs, name, pêşgotin, analîz û gotar nivîsîn. Bi vê yekê wî dixwest teori û pratîka xwe li hev bîne.

Sartre çapemeniya Frenseyê wekî şerxwaz û nijadperest bi nav dikir. Sartre sedema vê wiha diyar dikir: "Frense

rin, ceza lê hate birîn, lê wî xwe mîna wîcdanê cihanê didit, li xebatê xwe sor dibû. Li gorî Sartre serdest û dagirkêri nikarin wî tawanbar bikin, berevajî vê kesen ku divê bînê cezakirin ew bi xwe ne. Ew jî di demeke kurt de wê pêk bê.

Wî ji xwe re digot wîjdanê cîhanê. "Wîcdanê cîhanê" li aliyeke din bi ronakbîren mîna xwe yên ku li dijî dagirkiran tevdigeriyan re tekiliyê germ bi awayekî rasterast an nerasterast danîne. Tê gotin ku Sartre bi pêşgotina bo ro-

bi awayekî aktif şer kiribû û geleki kence dîtibû) dike. Sartre ne tenê dî şerê Cezayîrê de, di şerê Vietnamê de piştgiriya gelê Vietnamê dike. Sartre bi berhemîn xwe yên li ser felsefe, şanoyê û bi gotar û romanen xwe ji geleki navdar e. Ew di sala 1964'an de hêjayî Xelata Nobelê hate dîtin, lê wî ev xelat qebûl nekir. Li gorî wî xelata herî mezin ne xelata dagirkiran, azadiya gelan e.

## Rewşenbîrekî nefşbi-çük

Sartre her çiqas ne endamê Partiya Komünîst bû jî bo partîyê xebatê hêja kirine. Di salen ku mostefî dikir de ji bo ku nêzîki feqîran bibe, kravat nedixist stuyxwe.. Wî zewac wekî nêfîna birjûwa dinirxand. Nezewicî lê bi hevala xwe Simone De Beauvoir re (ku di liseyê de hevdu nas kiribûn) heta dawîya emrê xwe ma. Sartre di sala 1980'yî de ku 59 salî bû jiyanâ xwe ji dest da. Jiyana wî ji alyî pir kesan wekî "jiyana helwestê" tê binavkirin. Ispata vê ji 25 hezar kesen ku bo cenazeyê wi li ser goristanê li hev kom bûbûn, bû

Tê diyarkirin ku gelê kurd ne dûrî vê rastiyê ye. Dewleta tirk ji, ji hezar salan vir de xwedîyê ax dîroka Mezopotamyayê; kurdan wekî "tirkîn çiya" bi nav dike; ziman û çanda kurdan qedexe dike, bi kurtayî li ser navê kurd û erdiyariya wî; Kurdistanê her tişfi red dike. Ci tevger hebe bi rîbâzên qirêj dixwaze ji holê rake .

Li Tirkîyeyê rewşa çepgiran, raya giştî û çapemeniya tirk ji, ji ya frensiyan ne pir cuda ye. Lî li Tirkîyeyê kîmasiya mezin nebûn an jî hindîkbûna rewşenbir, nivîskar û hunermendêna mîna Sartre ye ku li dijî dagirkeryê, şerê qirêj (ku hîn jî didome) rawestiyane. Yen hene jî bi sed salan ceza lê hatiye birîn. Ji van kesan ê herî berbiçav Civaknas Dr.İsmail Beşikçi ye. Mamoste Beşikçi jî li dijî dagirkerya tirk û serdestan piştgiriya gelê kurd dike, bi xebatê xwe yên bêhempa vê yekê berbiçavtir dike.

Nivîskarê tirk Ragip Zarakolu li ser J.P.Sartre wiha dibêje: "Naskirina Sartre bo tîrkan bi taybetî jî bo kesen pêşverû yên tirk pêwîstiye pir girîng e."

Zarakolu ji bo Beşikçi fîkrê xwe bi hevokke balkêş tîne zîmîn: "Ew xwe rexnekirina gelê e"

# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

## Têghîn rêzimanî

**Tayên deng:** ses telleri  
**Zengelork:** adem elması  
**Rengedeng:** sesin tonları  
**Dengên dureng:** çift tonlu sesler  
**Birên hevokê:** cümlenin unsurları  
**Cinavka vegerok:** dönüslü zamir  
 Di nava xebata me de têgiheke bi vî navî cih negirt lê belê, di pirtûka Murad Ciwan de cinavk, xwe wekî "dönüslü zamir" hatiye binavkirin. Her di hinek xebatêni bi kurdî de jî cinavka vegerok hatiye bikaranîn.

Cinavka qertafî: ek şeklindeki zamir  
 Ji bo cinavka /-ê/ tu têgih nehatibû dîtin lewre jî wekî "cinavka ê" mabû. Lê di pirtûka Qanatê Kurdî de ew wekî "cınavka kurtkîrî" hatiye navandin. Li ser bin-geha vê cinavkê jî mirov dikare çend tiştan bibêje. Di pirtûka Celadet Bedirxan de tê gotin ku ew /ê/ ji kurtbûna cinavka /wê/ tê. Lê dibe ku ji qertafa tewandinê ya zayenda mî jî hatibe, lewre ew /ê/ ya "ewê" bi xwe jî qertafa tewangê ya zayenda navdîrêni mî ye.

**Paye:** rütbe  
**Payoya rûberî:** Karşılaştırma derecesi  
**Payoya rajorîn:** En üst derece  
 Di nava xebatê de me bo dereceye rengdîran peyva paye bi kar anîye, lê di

## - Wane 42 -

beşa têgihan de peyva "pile" hatiye bikanîn. Ji bo ravekirinê herdu têgih jî rast in. Bes pile zêdetir wekî wergera têgihan tirkî xuya dibe. Lewre me di nava xebatê de paye bi kar anîbû.

**Raweyêne pêşkerî:** belirtme kipleri  
**Dem:** zaman  
**Dema niha:** şimdiki zaman  
**Dema bê:** gelecek zaman  
**Dema bê ya nêzik:** yakın gelecek zaman  
**Demêne borî:** geçmiş zamanlar  
**Dema boriya têdeyî:** -di'li geçmiş zaman  
**Çirokiya boriya têdeyî:** -di'li geçmiş hikayesi  
**Dema boriya dûdar:** -miş'li geçmiş zaman  
**Çirokiya boriya dûdar:** -miş'li geçmiş hikayesi  
**Dema boriya berdest:** şimdiki zamanın hikayesi  
**Raweyêne daxwazî:** dilek kipleri  
**Raweya divêti:** gereklilik kipi  
 Ew rawe li gorî deman tê kişandin, di dema kişandina li gorî demê de guharîn di lêkera viyan de pêk tê.  
**Raweya mercî (hekânî):** şart kipi  
 Ev di vê raweyê de lêker li gorî deman tê kişandin. Guhartin di lêker de pêk tê.  
**Raweya xwestinî:** istek kipi

**Çirokiya raweya xwestinî:** İstek kipinin hikayesi

**Demêne hevedudanî:** birleşik zamanlar

**Raweyêne hevedudanî:** birleşik kipler  
**Raweya merc û daxwazê:** dilek şart kipi

**Çirokiya raweya merc û daxwazê:** dilek şart kipinin hikayesi

**Lêkeren alîkar:** yardımcı fiiller

**Çêbiwar:** miş yapılmış ortaç (Past participle)

**Ravekarî:** izafe

**Tîpen ravekirinê:** herfi tarîf

Di kurmancî de têgiha veqetandek bo van tipan tê bikaranîn.

**Kirpandin:** vurgu

**Hevokên lêkerî:** fili cümleleri

**Hevokên navdêri:** isim cümleleri

**Hevokên pirsê:** soru cümleleri

**Hevokên erêni:** olumlu cümle

**Hevokên neyinî:** olumsuz cümle

**Têrker:** tümleç

**Pêveber:** yüklem

**Xalbendi:** noktalama

**Nîşaneyen xalbendiyê:** noklama işaretleri

**Xal:** nokta

**Bêhnok:** virgül

**Pirsîşan:** soru işaretleri

**Bangnîşan:** ünlem işaretleri

**Xalecot:** iki nokta üst üste

**Xalebhênk:** noktalı virgül

**Kevanek:** parantez

**Dunik:** tırnak işaretleri

**Xêzek:** konuşma çizgisi

**Sêxal:** üç nokta

**Bendik:** kesme işaretleri

**Dubendik:** çift kesme işaretleri

Ew di cihê kevanekê de tê bikaranîn. Di zimanê îngilizî de zêdetir tê bikaranîn.

**Çavkanî:**

1) Bingehêne Gramera Kurdmancî, Celadet Bedirxan, Weşanê Nûdem, 1994

2) Türkçe açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi), Mûrad Ciwan, 1992

3) Hêmanê Rêzimanê Kurdi, Feqî Hüseyin Sağrıç, Melsa Yayınları, 1991

4) Rêzimanâ Zimanê Kurmancî, Reşîdê Kurd, 1956

5) Türkçe Izahî Kürtçe Grameri (Kürmanç Lehçesi), Kemal Badîlî

6) Kurmancî, Weşana Instituto Kurdi ya Parisê

7) Zend, Weşana Instituto Kurdi ya Stenbolê

8) Lekolîn, Weşana Instituto Kurdi ya Berlinê

**Têbinî:** *Geli xwendevanên hêja, bi vê waneyê, em gîhiştin dawiya mijara xwe. Li ser van waneyan hûn dikarin dîtin û rexneyen xwe ragihînin. Ev dê bo têkûz-kirina vê xebatê súdewar bin, lewre me dil heye ku vê xebatê wekî pirtûk biweşînin.*

dewlet li dijî kesen sivîl, saziyên demokratik li ser xeta hiqûqê bimeşe. Bo nimûne, heger hêzék bi tanq û topan êrîşê bibe ser kesen destvala, ev di kultur û jiyana mirovahiyê de tune. Dîsa heger gruben faşist ên ku ço û qalas û çek di dest de ne, êrîşê bibin ser jin û zarok û kesen destvala ku nikarin xwe biparêzin, ev helwest di çand û jiyana tu gelî de tuneye. Ji bilî Tirkîyeyê. Mixabin li Tirkîyeyê hê jî êrîşen bêpîvan û li derveyî hiqûqê neskinîne.

Li navendêne HADEP'ê endamên partiyê mirovên bêçek di nava çalakiye herfi bêdeng de ne ku zirarê nade tu kesî. Çalakiya greva birçûbûnî li her dera cîhanê her kes hurmetê jê re digire; polis û leşker tu hêz êrîşê nabin ser kesen ku vê çalakiye pêk tînîn. Bi tenê ev hovîti li Tirkîyeyê heye. Polis tevî faşîstan êrîşê dibin ser jinê kurd û hemû tele-vîzyonên tirkan jî bêtîrs û bêxem dîmenên hovîtiye diweşînin. Wexta ku mirov li van dîmenan dînihêre, pirsek tê bîra mirov: Gelo heta iro em çawa bi vê hovîtiye re jiyane?

Bi êrîşen li ser HADEP'ê careke din eşkere bû ku dewlet bi tu awayî naxwaze ku kurd xwe ifade bikin. Nijadperest Çoşkun Kirca digot ci? Wî digot: "Kesen ku ne tirk in mafekî wan heye, ew jî bêdengî ye." Ev tê vê wateyê ku li tu mafê xwe nepirse. Heger tiştek dane te, divê tu bi ew qasî qenaat bikî. Mirovêkî bêdeng û bêdaxwaz mafêni siyasi bi tenê ne, divê nan û avê jî nexwaze. Heger mirov bi bîr

û baweriyeke li aştiyê binêre, HADEP deriyekî astî û çareseriyê ye. Heger dewlet bixwaze ber bi aştiyê gavekê bavêje, deriyê ku HADEP vedike divê bibîne, le ne wisa ye. Êrîşen li ser HADEP'ê li dijî daxwaza aştiyê seranser dijî minî ne.


Dewlet nikare ku pêşiyê li HADEP'ê bigire. Ji ber ku HADEP bûye gel û pêşî bi hişyarbûna gel êdî ev ji dest dewletê derketiye. A du-diya dengê Têkoşîna Gelê Kurd gîhiştîye gelek cihan navendêni siyasi yên navneteweyî. Ev êrîşen li ser HADEP'ê raya gişî ya demokrat û dewletên rojavayı li cihekî not dikan.

Ji damezirandina HEP'ê heta HADEP'ê ev heş sal in ku bi işareten rayedarên dewletê êrîş dest pê dikan. Çendakê berî niha rojname-gerek bi navê İsmet Berkan di nîseke xwe de digot: Rayedarekî dewletê yê payebilind ji min re got "Em ê ji iro şûn de li HADEP'ê binêrin." Ev tehdît pişî êrîşen li ser Sûriyeyê hatibû gotin. Ev gotin ji aliyekî din ve jî balkêş in: Hinek kes û komên kurd ên siyasi hene, wan digot: "Heke şer bisekine dewlet wê dest bi firehkirina qada demokrasiye bike û mafêni kurdan binase." Ev gotin û êrîşen li ser HADEP'ê van çirokan pûç derdixin.

Her tiş li ber çavan e. Kes nikare veşere. Mixabin hê jî hinek kes naxwazin rastiyê fêm bikin. Çawa dibe ku ev êrîş û zordariya gemârî hê jî li nefsa hinek kurdan giran nayê? Dewlet hê ci bike, ci heqaret û zilmê bike ku ji nefsa van mirovan re giran were?

## Êrîşen li ser HADEP'ê

MAHMUT KILINÇ



**B**i rastî carinan mirov dixwaze ku li ser hînek mijarêne ne siyasi binivîse. Heta mirov xwe amade jî dike. Lê mixabin dema mirov dest bi xwendina rojnameyan dike an jî li nûçeyen televîzyonan guhdariyê dike, mirov helwesta xwe diguhere.

Ev nêzîkî deh salan e ku dewleta tirk bi hemû derfetên xwe êrîşan tîne ser gel û saziyên kurdan. Dema ku ew êrîş hebin, ma destê mirov diçe ser tiştekî din ku mirov li ser binivîse?

Gelo dewleta tirk ji HADEP'ê ci dixwaze? Çima her roj bi dehan avahiyên vê partiyê di bin piyên polîşen tirk de ne? Hê polîş jî bes nakin, tevî faşîstan êrîşê dibin ser zarok û jinan. Ev rewşeka bixetere ye. Li ser neteweyê din jî yên ku ji Anatoliyê derxistine an qitilkirine wisa dest pê kiriye. Divê gelê me yê ku li metropolên tirkan dijî ji bo ewlekariya xwe geleki hişyar be.

Li gorî şertîn mirovahiyê di navbera têkoşîna du hêzên li hemberî hev de pêwîst e di çekîn ku di têkoşînê de têbikaranîn de jî hevkêşeyek (muwazeyek) hebe. An jî divê

*Nameyek bo dayika şehîdekî:*

# Ew leşkerê Ahûra Mazda ye

**P**işti ramûsandina desten te, silav û hurmeten xwe ji we re pêşkêş dikim, dayika delal!

Dayika hêja! Wekî her salê, îsal jî ji bo bibîranîna Hevalê Seyfi ez nameyekê ji we re dînivîsim. Lé ev neyê wê maneyê ku em Seyfi bes di salvegera şehadeta wî de bi bîr tînin. Ji wê bêhtir her roj, her saet û her deqîqeya ku dibore, wekî hemû şehîdan hevrê Seyfi jî li ber çavê me ye. Em hêza xwe ji wan digirin. Ew, her wişa çavkaniya ronahîkirina jiyana me ne. Ew, rîber û serleskeren me ne.

Dayê! Şehîd ew in ku; stêrkên rûyê a-simanê me ronahî kirine, hêvî di rihe me de dane çandin û hêz bi hemû gel anîne, ji bo meşa azadiyê. Şehîd ew in ku; bi xwîna xwe ya pîroz axa welat av dane û

Şehîd ew in ku; di "Pira navbera mîrin û jiyanê de ne." Hezkirin ji welat, gel, mirovatiyê û li ser hemûyan jî, girêdan û hezkirin ji Serokatiya Partiyê re ye. Şehîd ew in ku; em ji nû ve bi ser xwe ve anîn û hinî karêن xwe yên bi rûmet kîrin û her wîsa dîroka wan dibe dîroka gelê kurd. Gelê kurd û mirovahî hêza jiyanbûna xwe ji şehîden me yên bi rûmet digire. Bi vî awayî li hemberî kedxwar û neyaran serê xwe yê mirovatiyê bilind û bilind dike.

## Belê dayika delal!

Te; Hevalê Seyfi bi şîrê pêşîra xwe xwedî kir. Bi nexewa şevan û hêstîren çavan te ew mezin kir. Bi çîrokên bapîrê yêzidî, Zerdeş û Kawayê Hesinkar zana û jîr kir. Te; ew ji bo ku li xwe û li te xwe-

made dikir. Lé rojeke bêbext bû. Roj mîna felekê li ser gelê me bervac bû. Roj 13'ê Reşemîya sala 1992 yan bû. Berf û seqem li pêşîya wî ne asteng û kelem bûn.

Hevalê Seyfi mîrxas bû. Qet zehmetî, westandin û eş nedizanî. Çawa ku tu ji zanî; dema cara yekem derbasî bakurê welêt bû, li ci zehmetî û astengiyêni dijwar rast hatibû. Yanê di serî de mîrxasî û lehengiya wî, xwe bi her kesî dabû xuyakirin. Hevrê Seyfi qehreman bû, jîr û zane bû û lehengê gelê xwe bû. Ji ber ku heta çika xwîna xwe ya dawî ji bo gelê xwe xebat kir. Ji ber ku bi vineke mezin her dem ji bo ku talimatén Mirovî Mezin pêk bîne kar û xebat dikir. Ji ber ku, ji bo ku soza dayî gelê xwe pêk bîne, xwedî bawerî û vineke mezin bû. Baweriya wî ew bû ku, sînorêneyaran danî, ji nava we-

Baweriya Hevalê Seyfi ew bû ku, sînorêneyaran danîne, ji nava welat û gel rake. Wî digot: "Ez yêzidî me, ji parce Başûr im. Lé welat yek e, ne Yêzidî û ne ji parce Serokatiye girtiye, welat bikime yek."

Ew, ji bo hêviya jiyanê ye. Ew, hêzajîyanbûna nû ya ku di bin Serokatiya Partiyê de té damezrandine. Ew, vîn, baweri û nûnerê Kurdistana serbixwe û azad e. Ew, leşkerê Ahura Mazda yê hemdemî ye. Li Welatê Rojê xwest ku "Komara Mirovahîyê" mîna Împaratoriya Medan a Mirovahîyê bide avakirin. Ew, leşkerê azadiyê bû. Leşkerê hezkirina paqîj û saj bû. Wî xwest, hezkirina ku gelê me ev hezar sal in jê bêpar e, yekcar bi ramanê Ahura Mazdayê Hemdemî pêk bîne, li ser xaka Mezopotamyayê. Wî, dergîşa mirovahîyê vejjîyand.


Wî, bi şehadeta xwe rûyê melûl yê zaraken Welatê Rojê geş kir û ji wan şervanen nû derxistin serê ciyê. Wî, hêvî, pehlewanî, mîrxasî, vîn, bawerî û hemûxisleten mirovahîyê di kesayetiya xwe de dabûn civandin. Ew, nemir jiyan bû û jiyanâ nemir da avakirin. Belê dayika hêja! Lehangê ku te mezinkirî bi şehadeta xwe tu ji mezin kirî. Bi şehadeta xwe şîrê te yê spî li xwe halâl kir û hezkirina herî rast nişanî te da û ev yek ispat kir.

Em bawer in ku qet ne mimkûn e em kesayetiya Hevalê Seyfi bînin ser zîmîn. Ji ber ku ew şehîdê Welatê Rojê ye. Şehîden Welatê Rojê jî bi nîvîsinê tenê neyîn ser zîmîn. Lewre ji bo ku mirovî karibe tevger û kesayetiya wan bide xuyakirin, divê Kurdistaneke azad û serbixwe ava bike. Ev yek jî bi şopandina xeta Serokatiye mimkûn e. Dîsa bi damezrandina Kurdistaneke ku misilman, êzidî, lewî û xiristiyan bi hev re dijîn, mirovî dikare şehîden Welatê Rojê bîne ser zîmîn.

Di dawiya nameya xwe de carekedin ez desten we radimûsim û silav û hurmeten xwe ji we re pêşkêş dikim. Şehîden me rûmeta me ne. Çawa ku Hevalê Seyfi soz û peyman dabû şehîden li pêş, em jî iro soz û peymanê didine şehîden xwe.

EHMED HUSEYÎN

\*Têbinî: Hevalê Seyfi (Selahdin Abdo) ji gundê Kibarê bi ser Efrînê ve ye.



Dayê! Te, bi lîlandinê Hevalê Seyfi şande nav refen gerîla. Xweş tê bîra min te şehadeta wî ji bi lîlandinê û bi serbilindi pêşwazî kir.

dara azadiyê sînkirine. Qirej û gemara sed salan ji mîjîyê me û ji ser axa welatê me paqîj kirine.

Şehîd ew in ku; gîriyê dayikên Kurdistânê dane sekinandîn û dilê wan ê ku çîlmisibû, sîn kirine, şahî pê anîne û giyan bi hemû zar û zêç, kal û pîr û xorîn me anîne. Şehîd ew in ku; mirin di Kurdistânê de dane kuştin û jiyan vejiyandine, ji mirinê jiyan dane afirandin û bi me dane şerînkirin. Çanda me ya neteweyî didin afirandin. Şehîd ew in ku; navên xwe dane guhartîn, ji Miho, Xelo, Çiya û Çekdar pêk anîne. Ji Fatê û Xecê, Zilan, Bêrîvan, Zekiye, Bermal û Rewşen pêk anîne.

dî derkeve hişyar kir. Dayê! Te, bi lîlandinê Hevalê Seyfi şande nav refen gerîla. Xweş tê bîra min te şehadeta wî ji bi lîlandinê û bi serbilindi pêşwazî kir.

Rojen Hevalê Seyfi yên ku me bi hev re derbas kîrin, ew munâqeseyen di navbera me de pêk dihatin û bêhtengîya te xweş tê bîra min. Bi taybetî pişti her munâqeseyê ew dengê kenê te û ramûsandina te ji serê me re wekî ku niha jiyan din bin li ber çavê me ye.

Dayê! Ez dixwazim hînekî ji te re li ser şehadeta Hevalê Seyfi û roja ku şehîd ketiye binivîsim. Roj, rojeke pir xayîn bû. Serma, seqem û bi berf bû. Wê rojê ji Hevalê Seyfi xwe ji bo çalakiyên mezin a-

lat û gel rake. Wî digot: "Ez Yêzidî me, ji parce Başûr im. Lé welat yek e, ne yêzidî û ne ji parce din qebûl dike. Ez ê bi xwîna û zanebûna ku min ji Partî û Serokatiye girtiye, welat bikime yek."

Ji ber ku Hevalê Seyfi ji we hez dikir û ji hemû gelê xwe hez dikir. Xwest malbata xwe fireh bike. Malbata wî bû cil mîlyon gelê kurd. Wî, dixwest bajarê Nemrûtê bide xirakirin. Ger Nemrûtê hemdemî ji ser axa welat neyîn paqîkirin, ne mimkûn e ku welat geş û azad bibe. Belê, tava Welatê Rojê bi xwîna Hevalê Seyfi hînekî din geş bû li ser xaka niştanî. Hevalê Seyfi bi cengewariya xwe perdeya li pêş tava mirovahîyê da veçirandin.

□ 17.12.1959:

**Bûyera 49'an**

Di roja 17'ê berfanbara 1959'an de hêzên dewleta tirk bi îdiaya 'cûdaxwazî û ajantiye' gelek xwendekar û ronakbîrên kurd girtin. Di despêka bûyerê de hejmara kesen girtî 40 bû. Di sala 1961'ê de hejmara wan gîhişte 49'an. Ji ber vê yekê 'Bûyera 49'an' tê gotin. Hin kesen di bûyerê de cih girtine Musa Anter, Yaşar Kaya, Medet Serhad û hwd. in.

**BÜYERINE JI DİROKÊ**

□ Berfanbar 1969:

**Kovara Doğu derket**


Kovara bi navê Doğu (Rojhilat) di meha berfanbara 1969'an de bi sloganı "Bijî biratiya gelan" dest bi weşanê kir. Di rûpela yekemîn a kovarê de xeta weşanê ya kovarê wiha tê diyarkirin: "Kovareke anti-imperiyalîst, anti-faşist, anti-asimilasyonîst, anti-feodalîst, anti-şovenîst, bi ronahiya sosyalîma ilmî li ser meseleya Rojhîlat diseke. Di kovarê de kesen wekî Musa Anter, Hasan Arfa, Atilla Tokatlı, nivîskarî kirine. Kovar ji 32 rûpelan pêk hatîye û bi salê carekê derketiye. Çend hejmarê derketine nayê zarîn.

*Portreya hunermendê nemir*

# Mihemed Şêxo

...  
Gula min kesk û sor û zer e  
Nîşana alê li ser e  
Gula min reng spî gewher e  
Evîn û peymana min î

Ay le gulê gula minê  
Şêrîna li ber dilê minê  
Ez gulê nadim bi malê dinê  
Ez li ber gulê têm kuştin...



**M**ihemed Şêxo ku navê wî yê resen Mihemed Salih Şêxmûs e, di sala 1948'an de li gundê Xecokê hate dinê. Ev gundê ku hunermend Mihemed Şêxo zaroktiya xwe lê derbas dike li Başûrê Biçûk girêdayî Qamişlo ye. Hunermend herwiha dibastana seretayî jî li vî gundê ku ji bûyîna wî re şahidî kiriye xwendîye. Mihemed Şêxo di 1965'an de li Qamişloyê dest bi dibistana navîn dike, du salan dixwîne, lê hin pirsgirêk rê nadîn ku kuta bike û bi şûn de vedigere Xecokê. Bi vê re ji bo wî dibistan xwendin di polaya duyemîn a dibistana navîn de bi dawî dibe.

Hunermendê nemir Mihemed Şêxo, ligel ku ji biçûkayî ve meyila wî li ser muzikê ye, pişti ku di sala 1968'an de li Qamişloyê tenbûrekî distîne û pê ve wekî derwêşekî dest bi gotina helbestan dike. Ew demekê bi awayê derwêşekî li nav gel digere û helbesten xwe di nav gel de di dibêje. Pişti demekê diçe Bêrûdê. Li wir li Navenda Xwendîna Yekîtiya Muzikê dixwîne û di sala 1972'yan de dibe endamê Hevgirtina Hunermendê Lubnanî. Pişti demekê vedigere welêt, li Rimelanê ji komeke muzikê re serkêşîye dike. Di heman salê de diçe Başûrê Mezin gelek stranen wî di Radyoya Bexdayê de têne weşandin. Gava ku vedigere Başûrê Biçûk, li wir ji aliye polîsên Sûri ve çend caran tê girtin.

Sal 1975, Mihemed Şêxo îcar diçe rojhîlatê Kurdistanê. Li vir dizewice, dikeve nav jiyana bi jin û zarok û sê zarokên wî çedîbin, bi navê Felek, İbrahim û Brûsk.

Di hemû helbesten Mihemed Şêxo de xem, keder, derd, kul û bindestî xuya dike û timî van tîne zimên. Ew li rojhîlatê Kurdistanê jî di hemû tevger û xebatên xwe de tê teqîbîkirin û di vê pêvajoyê de pir caran dike hedefa êrisîn rejhîma Şah SAWAK'ê. Ew di hemû lebaten xwe de ji aliye vê komê ve tê poşandin. Pişti ku ew

bî vê dihese, di sala 1982'yan de vedigere Sûriyeyê Şamî, pişti salekê diçe Qamişloyê û li vir bi cih dibe. Li vir bêrawestan xebatên xwe yên di warê hunerê de didomîne.

Hunermend Mihemed Şêxo bi tevgera têkoşîna gelê kurd gelekî kêfxwes û dişopîne. Tê îdiakirin ku gava ku ew şehîdketina Egît (Mahsum Korkmaz) dibihîse kaseteke xwerû li ser şehîdketina wî dadigire, lê hêzên serdest nahêlin ku gel vê kasetê ne bibîne ne guhdar bi. Her wiha ji ber vê kasetê tê binçavkirin. Pişti demek girtibûnê tê berdan.

Hunermendê nemir Mihemed Şêxo pişti ku tê berdan, ji îşkence û lêdaner nexweşiyek lê peyda dike û him bi him xedar dibe. Li gel ku dixwaze here Avrûpayê tedawî bibe jî giranbûna nexweşiya wî rê nadê. Mihemed Şêxo roja 17'ê sermawezâ 1986'an li Qamişloyê ji ber vê nexweşiyê dikeve û li vir nemir dibe.

SERWÎSA ÇANDÎ

**ÇAVDÊRÎ**

Me şah gotiye



SERKAN BRÛSK

**B**elê roja me hilatiye. Bi tîrêjên xwe yên berbangê me germ dike. Rih bi bedena me tîne. Zindibûn hinekî jî bi roniye ve girêdayî ye. Ev ji bo hemû giyandaran derbas dibe. Devera roj lê tune be, her tişt lê spîçolkî û xav e. Roj jiyan e.

Li gorî ku ew dibêjîn bi dehan caran wan em şikêndine. Ger ev serhildana me jî wek ên berê di nava çend rojan de tarûmar nebûbe, rola xwe fedakirinê fikirlêkîrî û bi awayekî pir û xwe tanzîmkirina gela mezin e. Dema ev bi hev re hatin meşandin êdî gel jî bi keda xwe, can, mal û hemû nirxên civaka tradisyonel di vê riyê de feda kir. Gelekî wek ê me çawa dikare roja xwe hilde? Çawa dikare ferqa hezar salan ji navê rake. Mirinê bi godt, xwîn û giyan bike? Ev mijarêne pêşerojê ne. Ji bo nifşen bê hêjayî ne. Roja me li Rojava hilat. Mirin di jiyanê de zindî bû. Tirba betonkirî wiha perçe bû. Berevajiya mirovahiyê bi berevajîtiyekî hate serastkirin. Tarza Serokatiyê ev e. Li devera ku mirin hesp xwe ji kêfa dilê xwe re dibeze, jiyan pişta mirinê dişkîne. Wê bi hemleyekê mat dike.

Santranc (kişik) leyistikek xweş e. Konsantrasyoneke kûr û tîr dixwaze. Leyistikek aqil e. Leyistikek ku pir zêde bikaranîna hêza aqil dixwaze ye. Aqil û aqil bi awayekî pir rasterast têne hemberî hev. Di santrancê de teknika herdu aliyan wek hev e. yên ku têne hemberî hev û din bi heman rex, hesp, fil, wezîr û şahan têne hemberî hev. Wekî din jî leşkerê sade yên herdu aliyan hene.

Tevi ku şer bi gelek aliyeñ xwe dişibe kişikê jî, bi hinek aliyeñ xwe jî ji vê leyistikê vediqete. Aliyeñ ku jê vediqete teknik, hejmara leşker û lojistik e. Aliyeñ wan ê hevbes, bikaranîna hêza aqil e. Her çiqas di şer de hêza aqil texribateke fizikî dide xwedîy xwe, yê himberî xwe û hemû zindiyê ku di nava seheya wê de ne jî, lê dîsa jî aliyeñ ku aqilê xwe baş bi kar tîne bi ziyanekê kêm, bi ser dikeve. Jixwe camêrekî gotiye "aqil desthilatdarî ye". Her wiha ronî ye jî. Yanî yên ku aqilêñ xwe herî efektif bi kar tînin, di leyistika santrancê, şer û jiyanê de bi ser dikevin.

Belê dema mirov karibe potansiyela aqil baş têxe xebatê, tu hêzên gewde mezin nikarin bi mirov. Dema mirov li destpêka şoreşa Kurdistanâ Bakur dinêre, ev rastî baştır jî mirov re ronî dibe. Şoreşa ku bi sê-çar keşan dest pê kir, di nava demeke kurt de giha merheleyeke wisa bilind ku hişê gelek mirovan nema digire. Hêzek ew qasî biçûk çawa dikare li hemberî hêzek wisa bi her awayê xwe mezin bigîhê vê encamê? Di nava bîst salan de çawa dikare neteweyek ku hemû xisleten wê yên neteweyeti hatîbin kesixandin, şax bide û şin bibe.

Tıştek baş zelal dibe. Herdu hêzên ku dîrokê ew anîne hemberî hev û din le gorî hev in. Tu ji kîjan aliyan ve binêri binêre tu dê rastî neheqîya dîrokî werî. Aliyek mezin e, desthilatdar e, bi tecrûbe ye, xwedî gotin e, dewlemed e, tîrsa xwe xistiye zikê beşek mezina cîhanê û aliyeñ din jî ha mir ha mir, nikare xwe li şipîyan bigire, damarê wê yê jiyanê dijene najene ne diyar e. Rewşa herdu aliyan wiha bû. Dîrokê di vê rewşê de starta leyistikê da. Leyistik an jî şer di mala yê nîvmîrî de dest pê kir. Yê xurt û qelew bi awayekî jîxwerazî xwe dada hemberiyê xwe û ew li erdê da. Careke din, careke din. Lê ev ci ye. Her li erdê dikeve bi rûhtir dibe. Her diçe bi hêztir dibe. Her ku leyistik dirêj dibe himberiyê mirî hemleyen êrisê bi kar tîne. Bi çend leşker û fermandarên xwe êrisên fikirlêkîrî tîne ser şahê hemberî xwe. Ü niha jî gotiye şah. Edî em û jîrektiya me.

# Özgür Radyo piştî girtina bo 90 rojan li ser Em ji berê daxwaz û xurti

**M**e li ser serpêhatî û helwesta weşanê ya Özgür Radyo, rexneyên guhdaran, weşana li ser kurdan, helwesta RTÜK'ê û taybeti û dijwariya weşangeriya radyoyê digel yek ji berpirsiyaren Özgür Radyoyê Sultan Arakanê hevpeyvînek pêk anî.

**Pêşîn hûn dikarin helwesta weşanê ya Özgür Radyoyê diyar bikin?**

□ Ji sala 1995'yan heya ûro xeta me ya weşanê hîç neguherî. Hin pîvan û rastiyen me yên neguherbar hene. Me tu caran negotiye: "Em ne bêlavan in." Me aliyê xwe diyar kiriye. Aliyê me aliyê kedkar, azadîxwaz û asfîxwazan e. Daxwaza me ew e ku em bi weşana xwe piştigirî û alîkariya van kesan bikin û hêvî û kêşeyen wan bînin rojevî.

Li aliyê din me dil nîn e ku em jî li ser sansûra RTÜK'ê bûyer û diyardeyan sansûr bikin. Bi taybeti em dixwazin bûyer û çalakiyên ku ji aliyê radyo û televizyonen din ve bi têra xwe nayê pêşkêşkirin, ragihinîn raya giştî. Wekî mînak, em dixwazin hêvî û çalakiyên karker, karmend, xwendekar, jinê nedekar û gelê li guhê bajaran ragihinîn.

Ev helwesta me, bandorê li bernamayen me yên li ser mûzîkê, siyaset û jiyanê jî dike. Lewre em doza weşaneke bikêr û têrnaverok dikan. Digel ku em bi hemû zimanen stran û kilaman diweşinîn jî, em doza muzîkeke hêja û serketî dikan. Bo nimûne, bêyî ku em li zimanen wan binihîrin, em stranen ku bi awayekî arabski hatine honandin, pêşkêş nakin. Dîsa em stranen kesen ku di warê muzîkê de hestfirosiyê (duyu sömürüsü) dikan, nawaşinîn: Wekî Tarkan, Mahsun Kurmizigül hwd....

Di warê weşanê de pîvana me ya sereke "dengekî cuda, şioveyeke cihêring" e. Lewre her çend em aligir bin jî, divê em di nava xwe de jî doza pirdengî û pirengîyê bikin. Ji ber ku bi vî awayî dê mirov bi şêweyekî baştır û bikertir li rewşa xwe bifikirin. Me dil nîn e ku em hin pîvan û rastiyen li ser mirovan ferz bikin. Lewre tu kes ne debeng û nezan e. Mebest ew e ku mirov bi xwe bifikirin, bipîvin û peyre jî pê serwext bibin.

**Wekî diyar e her diçe hejmara kanalén televizyonan zêde dibe lê digel vê jî gelek radyo derketin holê û hê jî derdi Kevin. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

□ Berê bi tenê kanaleke televizyonê hebû. Ûro gelek kanalén televizyonê peyda bûne, lê feraset yek e. Dibe ku di navbera kanalan de hin cudahiyên büyük hebin lê di warê naveroka weşanan de pûcbûn û aloziyeke mezin li dar e. Di serî de ji ber ku nû û rengîn bûn televizyonan



gelekî bala mirovan kişand, lê peyre ji ber yekalibûna weşanan mirovan rûyê xwe ji televizyonan bâda. Lewre medya ketiye taya berjewendiyen xwe yên siyasi û aborî.

Piştî demekê mirov di rojeva televizyonan de li jiyan û kêşeyen xwe rast nehatin û ketin taya vê yekê. Bo nimûne karkeran li ser arizîkirinê li nûçeyen berfireh û objektif rast nehatin. Dîsa şeniyê li guhê bajaran li daxwaz û hêvîyên xwe rast nehat û... Berî her tişti li vî welatî %80 mirov di bin asta sînorê xizaniyê de dijîn. Rojeva şenî di kanalan de nayê ragihandin. Lewre piştî demekê radyoyan bêhtir bala mirovan kişand ser xwe. Radyoyan wekî televizyonan di warê xavnaverokiya weşanan de nedaye navê! Lê mixabin heman nexwesi li radyoyan jî peyda dibin.

**Baş e. Avantajên radyogeriyê ci ne?**

□ Berî her tişti tu ne dîlê dîmenan i. Bêyî ku tu dîmenan peyda bikî, tu dikarî nûçeyê xwe ragihinî. Ji ber hindê radyo ji

Divê mirov xwe bixin şûna me û li gorî wê tevbigerin. Pergaleke hiqûqî heye. Bivê nevê divê tu li pey vê pergalê bimeşî. Li aliyekî daxwaz, li aliyekî pêwîstî! Bersiva vê pirsê ev e: Ku li vî welatî her kes çiqas azad e, em jî ewqas azad in.

hemû navgînê ragihandinê bilezir e. Lê televizyon dîlê dîmenan in.

Li aliyê din mirov bi radyoyê bêhtir dikarin dîtin û ramanen xwe der bibin û bi vî awayî bandorê li polîfikaya weşanê ya radyoyê bikin. Lê li televizyonan her tişti xwediyen wan diyar dikan. Mirov bi hêsanî nikarin xwe bigihînin televizyon û bernamesazên wan.

**Özgür Radyo xwe çawa finanse dike? Gelo ji aliyê aborî ve bûye radyoya gel?**

□ Me mebesteke bi vî rengî nîn e. Ji bo me tişte herî girîng piştigiriya gel û ragihandina rojeva gel e. Lewre karkereki/e SEKA'yê bûye şîrikê me an na ev bo me zêde ne girîng e. Tişte girîng ragihandina rastiya wî ye. Heye ku ev karker li ser diyarkirina polîtiya weşanê ya radyoyê ne xwedî raye be lê dema me daxwaz û xemên wî ragihandin, bi baweriya me şîrîkiya wî ne girîng e. Wekî mînak; HADEV'î, karkeren SEKA û Tuzlayê, lêzimên windayan hatin serdana me, me daxwaz û xemên wan bo raya giştî ragihandin. Li aliyê din Özgür Radyo piştigiriya guhdarên xwe bi şêweyekî xurt dest xistiye. Lewre dema weşana me hate rawestandin, du rojan telefonen me asê bun.

**Lê li aliyê din dema guhdar bibin şîrikê radyoyê lêxwedîderketin û piştigiri bi şêweyekî xurt pêk nayê?**

□ Bi baweriya me ev tiştekî sembolik e lewre ji bo piştigiriya radyoyê şîrîki pêwîst nake. Bi dîtina me tişte girîng hevdilî û hevramanî ye. Ev baweriya hanê diçe digihêje "Bingehe milk dad." Li ba me tişte girîng namûsa ramani ye. Di vî warî de problem rû nadin. Hin kes ji ber ku di karûbarê radyoyeriyê de nikarin bi ser bikevin, wekî sedem tengasiyâ aborî nîşan didin. Em ne di vê baweriye de ne. Ger tu rojeva gel bi awayekî obiectif û serketî ragihinî, dê radyo li ser piyan bimine. Jixwe piştî vê, gel bi reklaman piştigiriya te dike. Bi vî awayî karûbarê radyoyê digere.

**Wekî diyar e li Stenbolê gelek radyoyen çepgir karê radyoyê digerin. Gelo cudahî û cihêrengiya Özgür Radyoyê ji radyoyen din ci ye?**

□ Me dil nîn e em weşana xwe bidin ber radyoyen din yên çepgir. Ji ber ku her kes li gorî karîn û zanîna xwe dixwaze hin tiştan pêk bîne. Ev gotûbêj ne di cih de ye. Lê em dikarin gotin û kîrinên xwe bidin ber hev. Di vî warî de em serketî ne û bi helwesta xwe serbilind in. Lewre me soz û gotinên xwe bi cih anîn. Tişte girîng ev e. Em dengê xwe radigînîn, ne dengê kesekî din.

**Gelo li dijî êrîş û neheqîyan radyo bi awayekî xurt piştigiriya hev dîkin angô di vî warî de hewlén bo rêxistinê di ci astê de ne?**



Özgür Radyoyê piştî 90 rojan roja 17'ê sermawezê dîsa dest bi weşanê kir.

Guhdar di destpêkê de ezperest bûn û dil kirin me bikin qutya muzikê. Lé guhdaran pişti li bernamayên me yên rêtîn guhdarî kirin, bi dilxwazî bala xwe dan bernamayên derbarê siyaset, aborî û derûniyê de. Em di doza weşaneke têr naverok de bi serketin û em nebûn muzikdank.



Sultan Arikâan li ser dîtina ku; "Özgür Radyo pişti ku ji nûva dest bi weşanê kir, hejmar û naveroka stranên kurdî guherî" diyar dike ku berevajî vê, hejmara stranên bi kurdî zêde bûye û wisa dibêje: "Lé li aliyê din Özgür Radyo li gorî mercen taybet ên demê weşana xwe digerîne. Lé helwesta ji bo stranên bi kurdî û yên bi zimanê din ne wekî hev e."

◻ Bi awayekî giştî hevgirtina radyo-yan ne bi dil e. Wekî mînak dema Özgür Radya hate girtin, piştgiriyeke xurt ne-hate ragihandin. Jixwe dema hevgirtine-ke xurt hebûya, li Radyo Karacadağ, Metro FM hwd. bi salan ceza nedihat birîn.

Li layê din piştgiriye ku em kîfxweş kirin jî hebûn. Bo nimûne Radyo Umut tomargehîn xwe bo me vekirin. Ev ji bo me gelekî girîng e û cihê serbilindiyê ye. Lé hevgirtineke bi vî a-wayî têrî me nake. Ji ber vê çendê jî divê em piştgiriya xwe xurt bikin. Dema em girtina radyoyekê bes wekî nûçe ragihînîn, ku em mafdar bin jî, em dê vî mafî bi destê xwe bispîrin hin kesen din. Mîxabin di vî warî de proje kêm in û alter-natifîn berbiçav jî nîn in.

*Li tevahiya Tirkîyeyê rewşa birêxistinbûna radyoyeran çawa ye?*

◻ Hin rêxistin û proje hene. TÜRTEB (Yekîtiya Weşangerên Radyo û Televîzyonan ya Tirkîyeyê) heye. Lé naveroka xebata wê cuda ye. Dîsa BlA (Tora Ragihandinê ya Yekbûyi) heye. Bi vê projeyê radyo û televîzyonan xwe-cihî kaneyên nûçeyan (haber havuzu) pêk bînin û alîkariya hev bikin. Vê projeya navborî piştgiriya Yekîtiya Ewrû-payê jî peyda kir. Di nava vê projeyê de 100 sazî cih digirin.

*Rexneyên guhdarên we bêhtir di kîjan waran de berbiçav dîbin?*

◻ Di serî de guhdar ezperest bûn û xwestin me bikin muzikdank. Lé guhdaran pişti ku li bernamayên me yên rêtîn (kuşak program) guhdarî kir, bi dilxwazî bala xwe da ser li bernamayên derbarê siyaset, aborî û derûniyê de. Bi kur-tayî em di doza weşaneke têrnaverok de bi serketin û em nebûn muzikdank.

*Bi pey hin agahiyan, radyoyê pişti ku ji nû ve dest bi weşanê kiriye, hejmar û naveroka stranên bi kurdî guherîye...*

Berevajî vê yekî hejmara stranên bi kurdî zêde bûye. Lé li aliyê din Özgür Radyo li gorî mercen taybet ên serdemê weşana xwe digerîne. Bo nimûne, Çevre Radyo, ji ber kaseteke ku ji Wezareta Çandê bandrol wergirtibû, hate girtin. Wekî din mesele wekî ji dûr ve xuya dike, nîn e. Berî her tişti dema radyo tê girtin, ji aliyê aborî, derûnî û hem jî ji aliyê guhdaran ve kîmasî û mesrefen dij-war peyda dîbin. Bi awayekî diyartir, i-ro frekansek bi 100.000 dolarî tê peyda-kirin. Dîsa dema radyoyek tê girtin hemû hebûna radyoyê tê desteserkirin.

Li layê din ji ber tora weşana (yayin akişî) me ji nû ve hate rêtîn, guhdaran me hêj hînî wê nebûne. Em wisa bawer in dê pişti demekê van dîtinên xwe biguherîn. Lewre helwesta me ya bo weşanê neguherî. Wekî din me li dijî tu zimanîn helwest negirtiye. Yek jî em doza gerdûnîbûna muzikê dîkin, em cîma stranên bi kurdî pêşkêş nekin?

*Bi qasî ku li we diyar dibe, helwesta*

*dewletê ya bo stranên gurcî, lazî, cerkezî, erebî û kurdî wekî hev e?*

◻ Di vî warî de helwesta me diyar e. Em baweriya xwe bi gerdûnîbûna muzikê tînin. Her kes li me guhdarî dike. Tişte girîng daxwaza guhdarîn me ye. Lewre em straneke spanî û kurdî bi heman dîlfirehiyê pêşkêş dîkin. Lé rastiya welêt diyar e. Béguman helwesta bo stranên kurdî û yên bi hin zimanê din ne wekî hev e.

*Wekî em pê zanîn, hin radyo teví daxwaza guhdaran stranên bi kurdî ji bisînor dîkin. Hûn çawa tevdigerin?*

◻ Pîvan û sînorêne me ne li gorî çendîniyê (nicelik), li gorî çawaniyê têndanîn. Wekî din jî pêwîst e mirov hebûna RTÜK'ê ji bîra nake. Ger tu dixwazî weşana xwe bidominî û mirovan zana û agahdar bikî, divê haya te ji pîvanên RTÜK'ê hebe.

*Lé helwesteke bi vî rengî ji bo zordarî û çewsandinê dewletê wêrekir na-ke?*

◻ Xeta me ya weşanê neguherî. Divê mirov xwe bixin şûna me û li gorî wê tevbigerin. Pergaleke hiqûqi heye. Bîvê nevî divê tu li pey vê pergalê bimeşî. Li aliyekî daxwaz, li aliyekî pêwîstî! Bersîva vê pîrsî ev e: Ku li vî welatî her kes çîqas azad e, em jî ew qas azad in. Dîsa jî em lê dixebeitin da ku mafîn xwe heya dawiyê bi kar bînîn.

MAZLUM DOĞAN

## "EM NAXWAZIN BIBIN MUZIKDANK"

Serpêhatiya girtina Özgür Radyo, ji bo Fêmkirina sosretî û balkêsiya helwesta rayedarên Tirkîyeyê mînakeke geleki baş e. Radyo, ji ber nîvîsa Semih Hiçyilmaz a ku 8'ê pûspera sala 1998'an di Rojnameya Emekê de hatiye weşandin, tê girtin. Lé li aliyê din li dijî Hiçyilmaz û rojnameya Emekê doz nehatiye vekirin. Balkêş e, Özgür Radyo jî ji ber helwesta xwe ya bo kêseya kurd hatiye girtin. Hiçûqnas Hiçyilmaz di nîvîsa xwe ya bi navê "Li Bexçeyê Dibistana Şer de Cihê Vala Heye!" behsa "Buyera Sî û Sê Gulê" dike û balê dikşîne ser peykerê General Mustafa Muğlalî yê li Bexçeyê Dibistana Cengê û JITEM'ê, peyre jî wiha dinivise: "Hebûna JITEM'ê, ku li ber çavê her kesî ye û girêdayî artêşa tîrk dixebeit, nayê pejirandin. Baş e! General Mustafa Muğlalî ci kiribû? Gundiyên kurd gulebaran kiribûn. Ji ber ku tawanbar bûn? Na. Lewre wî wîsa dil kiribû. Lé pişti Muğlalî bi 50 salan JITEM ci dike? Gundiyên kurd gulebaran dike. Di ser de jî édi fermaña kuştinê ne general serçawiş radikin." Ev beşa nîvîsa navborî, roja 8'ê pûspere di bernamaya "Tersname" de tê xwendin. Li ser vê yekê RTÜK li hev rûdine û bi sedema 'cudaxwazî, fitnekariya neteweyî û şiddetperestiyê" roja 19'ê gelawejê weşana Özgür Radyoyê bo 90 rojan dide radiwestandin. Lé li aliyê din radyoya İslâmî Vahdet bi heman hincetan bo rojekê tê girtin. Pişti ku RTÜK'ê 28'ê pûspere bo Radyo Özgür bîrîvara rawestandina weşanê girt, xebatkar û guhdarîn radyoyê çalakî pêk anîn. Lé ev çalakî li éris û çewsandinê hêzên ewlekariyê rast hatin û gelek xebatkar û guhdar hatin binçavkirin. Berî ku weşana radyoyê were rawestandin du caran. "sezayê hisyariyê" bo wê hatiye ragi-handin. Rayedarên raydoyê diyar dîkin, ku ew ê li dijî vê bîryarê serî li Dadgeha Mafîn Mirovan a Ewrûpayê bidin.

Özgür Radyoyê pişti sê mehan, roja 17'ê sermawezâ 1998'an careke din dest bi weşanê kir. Radyo, yek jî 1056 radyoyen xwecîhî, 108 radyoyen herêmî û 36 radyoyen navwelatî yê Tirkîyeyê ye. Bi pey lêpirsîna Kovara Artı-Haberê, Özgür Radyo li Stenbolê di nava 120 radyoyan de, di warê lêguhdarîkirinê de di rîza çaremîn de cih digire. Özgür Radyo di sala 1995'an de bi awayekî ezmûnî (deneme) dest bi weşanê kiriye. Radyo li ser frekansa 95.1 weşanê dike û pêgeha weşana wê hêrema Marmarayê werdigire. Radyo, endama TÜRTEB (Yekîtiya Weşangerên Televîzyon û Radyoyan a Tirkîyeyê) û BlA (Tora Ragihandinê ya Yekbûyi) ye.

Her çend radyo piranî wekî "muzik-dank (Müzik Kutusu)" têñ binavkirin jî, lê Özgür Radyo di vî warî de xwedî helwesteke tund e û li dijî vê yekê radibe. Dema mirov li naveroka bernamayen radyoyen dînihêre, ev yek xwe dide der.

# Qapaxa Beroşê

**T**exsiya sor a bi markaya Şahîn ji Seyrantepeyê ber bi Bağlaran ve rê digirt. Polîsê sivîl ê li milê rastê yê Serhat rûniştî, bi dengekî sar û qure ji yê li pêşîya erebeyê rûniştî pirsî: "Berçavk heye?"

Polîsê li pêşîya erebeyê rûniştî, dosya stûr a di destê xwe de li ser refa li pêşîya texsiyê danî û qapaxa çaviya torpîdoyê vekir. Bêyî ku lê binihêre, destê xwe tê de gerand. Bi dengekî gur û ferمانî, ku jê xuya bû ew şefê wan e, got: "Berçavk tuneye!" Wê demê her du polîsen li milê rastê û çepê yê Serhat rûniştibûn, serê Serhat tewandin nav lingên wî, bi berstûka éçilikê wî girtin, ew kişandin serê wî. Her du polîsan zendên xwe dane ser pişta wî, ew di nava xwe de winda kir. Singê Serhat bi çokêñ wî ve zeliqî, nava wî di hev de repisî, janeke tû kete nava moriya pişta wî. Polîsê li pêşîya erebeyê rûniştî, bi dengekî tinazwari, bi ser Serhat ve zivirî û got: "Te ci kiriye lawo? Ka wekî mîran a rast ji me re bibêje, da em te nespîrin leşkeran! Navê wan li ser e: Leşker! İnsaf bi wan re tuneye! Mirovan dikujin." Bi rastî Serhat dixwest bibêje: "Ka min ci kiriye!" Lê nihert ku bêhna wî diçike, dev jê berda...

Pakêta cigarê, pere, kember û heçî tiştên di bêrîkêñ wî de bûn, li ser maseyê pê dane valakirin. Nav, navnisan, jimara telefonê, navên hemû maliyên malbatê û heta xizmîn dûr û nêzîk û karê wan, nav û navnîşana wan...hemû jê pirsîn. Potê pê çavê wî girêdabûn car din jidandin, ew birin odayeke din. Serhat hest kir ku gelek kes tê de hene. Demekê bêdengiyek li odayê peyda bû. Şege seqa tizbiyê ev bêdengî xira kir. Bes dengê tizbiyê dihat: "Şeq...şeq...şeq..."

Serhat li ser textekî dane rûniştandin. Dengekî zîz û bi hêrs, dest bi lêpirsinê kir. Pirsîn berê dubare kirin: nav, paşnav, malbat, kar, lêzim...Bêhna Serhat teng bûbû. Wê dawiya pirsan heta ku here? Polîsekî got: "Binihêre! Ev der işkence xane ye! Em li vir jop dikin qûna mirov û di devê wî de der dixin. Mirov be! Wekî mirovan bersivîn rast bide. Nêxwe tu yê mirî ji vir derkeyî!" Cardin pirsî: "Xwişkêne te tunene?" Serhat lê hay bû ku navên her du xwişkêne xwe nejimartibû. Bi dengekî súcdar got: "Belê du xwişkêne min hene!" Polîs wekî ku wî li ser súc biqefèle got: "Va ye! Hûn ev in. Hûn jinan mirov nahesibînin! Heta hûn birçî nebin û kî... we ranebe, hûn wan bi bîr neynin." Hate bîra Serhat ku ew çendî ji xwişkêne xwe, diya xwe, jina xwe û çendî ji dayikan hez dike. Xwest di bin vê hegerata wî de nemîne. Lê zû têgihişt ku ev kemîn e, ev zixt e, ew dixwazin wî bidin axaftin. Gotina xwe li gewriya xwe qefalt. Polîs, gelek pirsîn eletewş jê pirsîn. Paşê bi dengekî

bi hêrs got: "Xwedê bike tu bibêjî; Ez Y.A jî nas nakim!" (Tipa X wekî H bi lêv kiribû). Şirpîniyek ji nava dilê wî çû. Serhat ew baş dinası. Pê hesiyabû ku X. niha li girtîgheye. (X. bo Partiyê xebitibû. Par reviyabû. Heta li gorî gote-gotan gelek pere jî ji xwe re biribûn. Paşê teslim bûbû û anîha itîrafkar bû.) Hey gidî X... hey! Hemû dinê bigota X. bûye xayin, Serhat bawer nedikir. Belê...belê. Ew şeqa şeqa tizbiyê! Erê lê...! Hate bîra Serhat ku wî berî vê bi salan tizbiyek ji kevirên Oltu diyarı X. kiribû. Şeqqq... şeq... şeq. Şeqâna tizbiyê wekî çakûçekî li nav dil û

çavên wî bi potekî hişk girtî. Ji nişke ve aveke cemedî, wekî qeşayê, wekî devê kêtê tûj, aveke bi çid li newqa zikê Serhat ket. Serhat got belkî avê zikê wî quâkir....

Li odaya lêpirsinê, Serhat destekî xwe dabû ser pêşîya xwe, yê din li ser pêşîya xwe wekî şivekê sekinibû. Şeqê şeqa dengê tizbiyê û şipa şipa dilopên avê, ku ji bedena Serhat diçilkiyan, li ser erdê tevîhev dibûn. Serhat li ser ca-wekî plastikî ramedandin. Çaqen wî, he-ta ji hev vedibûn, ji hev kirin. Mirovek li ser lingekî wî rûnişt. Desten wî ji hev kirin û mirovek jî li ser destê wî rûnişt. Yekî jî qûna xwe da ser serê Serhat. Des-tekî bi le-pik. Le-pikên hevr-i ş i m î hêdika çû s e r h a - cetê

çû nav ranen Serhat. Serhat diqiriya diqiriya. Heta jê dihat diqiriya...

Tiştekî wekî rûnê helandî rijandin ş singê wî û mişembekî bi qasî bihostek fireh û wekî pif tê de be, avêtin ser sing Serhat. Jê de qabloyeke tazî di qulik hacetê mîrânî yê Serhat re dewisandî hundir: "Tu nabî mirov! Ne wer? Ez ê geber bikim! Baş bifikire. Wekî zilmâ biaxiv. Tu yê bibêjî? Hiii..."

Beroşike tişlik hate ber çavê Serhat. Beroş, tişlik: İsot, firangi, bîlican.... Beroşek tişlik û sergirî. Serhat hêdika destê xwe dirêjî beroş tişkê kir. Destê Serhat li ser qapaxa beroş bûn. Di navbera rakirin û ranekin na qapaxa beroş de maweyeke ku mabû. Ger qapax bîhata rakirin, wê od tişlik tîrşik bûba. Ne ode bi tenê, derûdu û heta kûçe û heta bi nîvê bajêr wê bi tişkê tişlik bûba. Wê ji hev bipirsiyana "Ma kê ev tîrşik rijandiye?" "Serhat Serhat...." Ü wê nav û dengê wî li her a lî belav bûbûya: "Naaa..Na! Ez nizam... Nas nakim...! Min nedîtiye..."

Hey Edîson! Ma te elektrik ji bo çîcat kir? Ji bo ronyê an ji bo ku mîneyê pê bixebeitin û ji bo... Hemû laş Serhat dilerizî. Nava wî dişewitî. Hawa dikir... Dev û lêv, ziman, qirik zip ziwa... Kaniya bin zîmîn jî miçiqî. Hinay û kezeb, her der, hemû laş zip ziwa. Serhat diqiriya lê dengê xwe nedîbihist. Ü êdî canê wî jî nedîşîya...

Li bin avê hişê wî hatin serê wî. Avashid, sar, wekî qeşâ, wekî kêtê tûj. Avashid herî zêde li nav ranen wî diket, li hacetê mîrânî. Jana avê, ji hemûyan xedartir bû. Nav zip ziwa û dişewitî. Avashar a bi şid ji laşê wî post dikir...

Cihê ku Serhat bi her du desten xwe yên bi kelepçebûyî lê daleqandibû, qili-ma dixebeitî. Bayekî sar, wekî bapûka çila zivistana reş laşê Serhat ya şîl dialast Serhat wekî tûra li nav avê dilerizî. Dî-qefîlî. Nava wî wekî tenûreke sincirî dişewitî...

Cihê ku Serhat bi qayısheke wekî melext bi darekî stûr ve girêdan. Dan hêdî hêdî ji erdê bilind dibû. Tevâhiya giraniya laşê Serhat bi milen wî ve daleqandî mabû. Qefesa singa wî di hev dî dieciqî. Parsûyên wî di nava wî de, di kezeba wî de diçikiyan. Dil, kezeb, pişik û hemû hinavên wî dikirin, di devê wî de bêne der. Damarên bin çengê wî ji ber giraniya laşê wî dikirin ku çîr û bi-gebetin. Heman deng cardin qiriya: "Bibêj!...Ka bibêj...Lawo bibêj..." Ji Serhat qirîniyeke bi xirexir çû: "Na...."

Beroşa reş, bi tenê. Tevî qapaxa wê gilolo bû. Çû heta newalê. Kete nava avê. Ava gû. Beroşa tişlik çû... çû... Hey çû...



mêjîyê

Serhat diket. Serhat çiqas ji X. hez dikir. Heyranê wî bû. Serhat xwe wekî ehmeqan dihesiband. Di ber xwe de got: "Ez çendî ker im! Qet mirovan nas nakim." Ev fikir wekî birûskê di nav çend keliyan de di nava mêjîyê wî de li hev ketin. Bi dengekî jixwebawer got: "Na. Ez keseki wisa nas nakim."

Polîs bi edakî kone got: "Diyar e. Tu nabî mirov!" Serhat rakir ser piyan û gotê: "Kincen xwe ji xwe bike!" Serhat kincen xwe ji kirin bes derpik lê ma. Heman dengê bihêr got: "Wan derxe! Bilezîne!" Polîsekî çend ta ji porê Serhat xistin nava pêçiyen xwe û ew li pey xwe kaş kir. Di koridorê dengê muzikê guhê mirov ker dikir. Serhat biribûn odayeke fayanskirî. Serhat çip tazî bes

mîrânî yê Serhat. Xwe-diyê dest dikeniya. Kenê wî dişibîya kenê jinekê, ku li hembêza mîr be. Destê bi lepik hêdî hêdî mist dida. Mist dida... Ji nişke ve, dest bû hesin. Bû mengene, bû mencinîq. Jidand...jidand...ji...: "Hawarooo... Ev ci ye? Hawarrrr...Bisekinin.... Ez dibêjim..Hûn ci bixwazin, ez ê bibêjim. Bise...."

Yê ku qûna xwe dabû ser serê Serhat, rabû ser xwe. Desten wî jî berdan. Serhat ji navê jortir xwe rast kir. Bi helke helke nefes da û girt. Polîs got: "Ka bibêj!" Serhat bi kelogirî got: "Bi xwedê û pêxember û bi....b....Nizanim!" Polîs bi hêrs û qirîn got: "Ors... Dê ...Jin .... Tu tinazan dikî...ne?" Porê Serhat bi paş ve hate kişandin, ew qûna mezin çû ser eniya Serhat rûnişt, cardin li ser destan rûniştin û destê bi lepikên hevrîsimî

Navenda Çanda Mozopotamyayê ya Îzmîrê

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



YÇKM

- **12.12.98, yekşem:** Belgefîlmê 'Baraka', saet: 16.00
- **13.12.98, yekşem:** Çalakiyên derheqê hefteya mafêñ mirovan de "Mafêñ mirovan 50 salî ye" Danışana DlAyê. Pêşkêşyan: Şaban Dayanan Koma Helbestan a AKM (Navenda Çanda Alternatif)'ê, saet: 15.00
- **17.12.98, pêncem:** Konsera Onur Akin, saet: 19.00
- **19.12.98, şemî:** Filme "Li Hekariyê demsalek". Derhêner: Erdal Kiral, saet: 16.00

Konsera Koma Vendîdat (NCM'ya Mêrsinê), saet: 18.00

● **18.12.98, mî:**

Konsera Koma Azad 'Şemal', saet: 18.00


● **19.12.98, şemî:**

Konsera Koma Azad 'Şemal', saet: 18.00

*Mahmud Baksî hate bixelatkirin*

# Kurd bi edebiyata xwe

## İñ ketlin rojevê



Baksi, di meha avrêla bîhûrî de jî, ji Awistûryayê jî xelatek bi vî rengî standibû.

### 'Hêlin' rewşa kurdan tîne zîmîn

Romana Baksi ya bi navê "Hêlin" ji xeyni zimanê kurdi, ketiyê zimanê elmanî, îngilîzî, fransîzî, swêdî, ispanyolî...

Baksi, di romana xwe de wêneyek ji Kurdistanê çêdike û balê dikişine ser rewşa kurdan. Jixwe nivîskar jî, ji ber van sedeman hate xelatkirin.

Nivîskarê kurd Mahmud Baksi, ji xeyni vê xelatê di meha avrêla bîhûrî de jî, ji Awistûryayê xelatek bi vî rengî standibû.


### 'Ev xelat a Öcalan e jî'

Baksi li ser xelata 'Kobraya Şîn' ev daxuyanî da rojnameya Azadiya Welat: "Ev xelat, a min û ya dostê min ê kevin û birayê min ê hêja Abdullah Öcalan e. Hêviya min ew e ku em xelatên wisa li paytexta welatê xwe Ahmedê, hem bidin hunermend û nivîskarê xwe hem jî bidin ên biyanî. Ez li vir bang li ciwanêñ kurdan jî dikim: Eger em serkeftinê xwe yên şer bi pêñusa xwe binivîsinin ê hingê berhemêñ mezin jî, derkevin holê."

PERWER BENGÛ ALMANYA

## TİŞK

Bernamey  
aştî



BEŞİR ŞİWANÎ

L e diway koçî Serokî Giştî Partî Kirêkaranî Kurdistan (PKK) Abdullah Öcalan bo Roma, kêşey kurd be hemû giranî xoyewe çûte naw ray giştî cihan be giştî û Ewrûpa be taybetî. Sereray helwêstî naşarestanî Turkiye û sûrbûnî le ser dawakirdinewey Öcalan û retkirdinewey hebûnî kêşey kurd, Roma be piştgirî paytextekani tirî Yekêtî Ewrûpa (YE), le helwêstî xoy nayete xwar û nek her razî nabê ke pêşeway kurd bidatewe be Ankara, belkû heman kat dawa dekat careserêkî rewa bo kêşey kurd bidozrêtew. Ewrûpaş ray legel İtalya da ye û Perlemanî Ewrûpa (PE) ta êsta çendîn pêşniyarî bîryarî pesend kirdiwe ke daway diwayî, hênan be şer û dabinkirdînî mafê netewayetiyeke ñ gelî kurd dekat.

Le ser astî berey kurdî, Serokî Giştî PKK Abdullah Öcalan rojî 25/11/1998 bernameyekî pékhâtî le 7 xalî rageyand bo çareserkirdînî kêşey kurd le serûy Kurdistan. PE's hefteyek diway bernamekey Öcalan, wate heftey yekemî em mange, pêşniyarî bîryarêkî pesen kird ke le nawerok da ciyawaziekî autoy niye legel pêşniyerekey Öcalan. Her çende bernamekey Öcalana û bîryarekey PE's layenî kemî daxwaziyekanî gelî kurd le xo degirin, belam deşê bigutrê ke seretayekî baş e bo destpêlîrdinî guftûgoyekî aşkîra û rewan le nîwan niwêneranî gelî kurd û dewletî turk da. Ankara hemîse le metîrsî dabeşkirdînî Turkiye dejî û pêy wa ye ke destbirdin bo çareserkirdînî kêşey kurd debête hoy dabeşkirdînî xakî Turkiye. Belam herdû bernamey layenî kurdî û bîryarî (PE), cext le ser ewe deken ke kêşey kurd le ciwarçewey xakî Turkiye da çereser bikrê, le bernamey kurdî da lew bareyewe dewitîr: "Otonomî bo herêmî Kurdistan bê têkdanî sinurekanî Turkiye." Le bîryarî PE da, bem şêweye bas le gwarey dahatûy bakûrî Kurdistan dekrê: "Le ciwarçeweyek da ke ziyan be yekparçeyî xakî Turkiye negat, dest bikrê be giftugo legal niwêberanî gel kurd."

Em rageyandine karî Ewrûpa bo çareserkirdînî kêşey kurd asan dekat û pêwîst dekat hewlî cidî bidat lew pêname da, le ber ewey kêşeye be tenya kêşey kurd û Turkiye niye, belkû le heman kat da kêşey Ewrûpa ye. Belam wekû witim Ankara hemîse nikolî le hebûnî gelî kurd dekat û natwanê le ciwarçewey metîrsî parçêbûnî Turkiye xoy bêne der û her le heman goşenîgawê bo bîryarekanî (PE) derwanê.

Pêwîst e Ewrûpa be şêweyekî babetî helwêstî herdû layenî kurdî û turkî hellisengêñê û bîryar bidat kê legel dozînewey çereser û astî da ye û kê le dije û guşar bixate ser ew layeney ke mil bo astî nadat. Yan kirawetir bilêm êsta top le gorepanî Turkiye û Ewrûpa da ye û gelî be hîwa ye hawkarî bikrê la çereserkirdînî kêşeyek da bo ewey astî û asayış bal ber ser herêmeka da bikêşê û hemû layenekan dest betal bin bo binyadnanewey paşmawey şer û xizmetkirdin be karwanî mirovayetî û şaristanî.

# Apê Bekir

Apê Bekir şîr û şekir  
 Çû gayê beş ji tewlê vekir  
 Xist stû berpîk û nîr  
 Gêsin anî cotek saz kir  
 Bi wî cotî xweş ax rakir  
 Genim çand erd teraf kir


Barna hat berf bi ser da  
 Qir û qeşê ew berneda  
 Lê zivistan pir dom neda  
 Bahar xweş hat di ber da

Zîlê genim serî hilda  
 Baran hat rojê lêda  
 Apê Bekir tirpan hilda  
 Alîkar bû meta Sada  
 Genimê sorik xist kewaran

Bihar havîn û payîz  
 Zû derbas bû wekî fiz  
 Sir û seqem bû zivistan  
 Pir giran bû berf û baran

Bo felatê hatin şervan  
 Ji berfê ew bê tevger man  
 Rojek dudu, sisê û çar  
 Şikeft û berqef ji wan bû war  
 Lê berfa pûk hîn dom dikir  
 Şervan ji ber wê mane bêçar

Apê Bekir vê dibihîze  
 Tê ji malbatê re dibêje  
 Keça wî ber bi tewlê  
 Meta Sada ber bi hespê  
 Haziriyan dikin ew ji bo rê



Genim ji kewarê anîn  
 Li ser hespa xwe danîn  
 Apê Bekir girte hevsar  
 Di rî de kir qîr û war

Pir lezand qenc û baş  
 Paş ve gîhaşt nêzîkî aş  
 Bar danî silav da qeras

Got: Ez Bekir im, Bekrê Kurd im  
 Ez xizan im lê pir merd im  
 Şervanê me man e birçî  
 Bênan in ew tev mane tî

Dijminê me ye roma xedar  
 Ez rî nadim wan qet tu car  
 Li welat her heye şer  
 Hevalê me rest li kember

Di cengê de ew in wek şêr  
 Ew ê bînin ji me re zafer

Lo qeraşo lo qeraşo  
 Bigerîne kevrê aşo  
 Zadê min zû bike arvan  
 Hêj nabihîstine mît û ajan

Dê keça min bike hevîr  
 Bûka min lêdixe tîr  
 Sada agir vêdixe  
 Sapê nan li sêlê dixe  
 (Dê bidome) BAGER BAGER

**Metelok**

Lingê min tevizî  
 Marek gevîzî  
 Xalê min beran dizî  
 Da bi nanekî tisî  
 Jina şivên nanek dizî  
 Da bi ta û derzî  
 Bi derzî lingê min bezî  
 Ji min re hat birazî  
 Ber bi çiyayê me bezî

## Pisîk û Pîrê

**Y**ew bî, yew çinêbî. Yew Pîre bî, yew  
 peyra nana pisînge dima, qedûm da-  
 na boçê aye ro, boçê aye tera kena. Pisîn-  
 ga boçeqole remena şina miyanê emba-  
 zanê xo. Embazê ci awonenê ke boçê a-  
 ye pawa niya. Pisînga boçeqole miyanê  
 xo ra qewernenê.

Pisînga boçeqole ageyrena, şina verê  
 Pîre, vana:

– Pîrê, pîrê. Ez bextê to de wa, boçêm  
 bide min. Embazêm şinê deşte, min wa-  
 ro merdenê. Pîre te ra vana:

– Ti zî şo şitê min biya, ez boçê to bi-  
 dî. Pisînge warzena şina verê bize. Bize  
 ra vana:

– Bizê, bizê. Şit bide min, ez berî bidî  
 Pîre, wa Pîre boçêm bido min, embazêm  
 şî deşte ez waro.

– Ti zî şo min rî velg biya. Pisînge şî-  
 na verê dare û ya ra vana:

– Darê, darê. Ti velg bide bize, wa bi-  
 ze şit bido Pîre, Pîre boçêm bido min.  
 Embazêm şiyê deşt e, ez waro menda.  
 Dare pisînge ra vana:

– Şo min rî hîne ra aw biya. Pisînge  
 şina serê hînî, vana:

– Hîne, hîne. Ti aw bide dare, wa dare  
 velg bido bize, bize şit bido Pîre, Pîre  
 boçêm bido min. Embazêm şiyê deşte ez

waro menda. Hîne, pisînge ra vano:

Ti zî şo, keynan biya wa min sero kay  
 bikerê.

Pisînge şina verê keynan, vana:


– Keyney, keyney. Bêrê hînî ser ro kay  
 bikerê, wa hîne aw bido dare, dare velg  
 bido bize, bize şit bido Pîre, Pîre boçêm  
 bido min. Embazêm şiyê deşte ez waro  
 menda. Keyney, pisînge ra vano:

– Pişê, pişê. Pişa boçeqole, şo ma rî  
 qonderan biya. Pisînga boçeqole warze-  
 na şina verê goşkarî vana:

– Goşkar, goşkar. Ez bextê to de wa.  
 Ti qonderan biderze, ez berî bidî keynan,  
 wa keyney xo pay kerê û şerî serê hînî de  
 kay bikerê. Hîne aw bido dare, dare velo  
 bido bize, bize şit bido Pîre, Pîre boçêm  
 bido min. Embazêm şî deşte ez waro  
 menda.

Zerê goşkarî bi pisînga boçeqole veşe-  
 na. Goşkar qonderan derzeno dano key-  
 nan, keyney şinê serê hînî de kay kenê,  
 hîne aw dano dare, dare velg dano bize,  
 bize şit dana Pîre, Pîre boçê pişê dana ci.  
 Pisînge, heta boçê xo nana xo wa, pêro  
 embazê ya şinê deşt e û ya waro manena.  
 Estanikê ma li nê diyaran. Rehmet li da  
 û bay goşdaran.

ARÊKERDOX: R. LEZGÎN



# Bi çavên serbazekî îngiliz: “Di nava kurdan de jiyana suriştî”

**M**ajor Frederick Milingen serbazekî bi xwe binyada îngiliz e. Dewleta Osmanî, wî bo yekîneyen leşkerî yên li Bajarê Wanê peywîdar dike. Di sala 1870'yi de diçe Kurdistanê. Pêşiyê diçe Erziromê, piştre ji wir diçe Wanê. Di encama rîwîtiya xwe ya ji Erziromê hetanî Wanê de der barê erdnîgarî, avhewa (iklim), jiyana kurdan a civakî, çandî û dîroka kurdan de gelek çavdêrî û agahîyen cihêregî dinivîse. Piştre van agahî û çavdêriyên xwe di pirtûka xwe ya bi navê “Di Nav Kurdish de Jiyana Suriştî” de kom dike. Ev pirtûk ji hêla Nuray Metci ve li tirkî hate wergerandin û di nav weşanên Dozê de hate çapandin.

Nivîskar di pirtûkê de digel kurdan, erdnîgariya Kurdistanê jî bi kîtekitî û dorfirehî dişayesine. Li hemberî suriştâ Kurdistanê matmayî dimîne. Bi vê yekê ve girêdayî di pêşgotina pirtûkê de dibêje: “Li gorî gotinan, mirov li bâkurê Kurdistanê hatine afirandin. Ev yek di Încîl û Tewratê de jî derbas dibe. Ger mirov surişt û erdnîgariya herêmê rûberî van agahîyan bike, digihêye vê baweriyê. Di beşa duyemîn a Tewratê

de “Bexçeyekî Bihuştê” heye. Bexçeyê navborî li qeraxa çemekî ye. Ev çem jî dibe çar şax. Ji van çar şaxan sê şax ji Kurdisanê dizên. Gihanraasar (Erez), Hiddeke (Dîjle), Euphrates (Ferat). Lîder barê Pison de tu agahî nîn e.

Milingen di warê nivîskariyê de kêmşareza ye. Lewre tê zanîn ku bo lêkolîn û çavdêriyan hin pîvan divên. Berî her tişîfî rîbâzên nivîsandinê û objektifbûn e. Lî mirov di pirtûkê de li van pîvanan rast nayê. Bi taybetî di şewaza wî de qureyî û pozbilindiya wî berbiçav e. Bo nimûne, ji ber hovîtiya hin eşiran, tevaya kurdan wekî mirovên dilgirs û çavşor bi nav dike. Her wiha ji ber kêmagahî û pêşdaraziyên xwe der barê baweriyê kurdên êzidî û elewî de jî agahîyen gelekî çewt dide. Wekî mînak, bo baweriya elewîtiyê wiha dibêje: “Baweriyeke pir serbest e. Nevî bi pîrikên xwe re dikarin bizewicin.” Ji bo ayînên êzidiyan jî dibêje: “Bo keyayê dojehê şevan li dar dixin.”

Mirov dikare di pirtûkê de li ser çand, jiyana civakî û dîroka kurdan hin agahîyen balkêş bigire. Ji bo kurdan dibêje neviyên kardûxan in. Her wiha

behsa pirtûka Ksenefones a bi navê “Vegera Deh Hezaran” (2400 sal berî wî hatiye nivîsin) dike, çavdêriyên xwe û agahîyen di pirtûkê de rûberî hev dike. Ji bo vê jî feribot û firaqên ku ji birinc hatine çêkirin wekî mînak dide û dibêje ev amûrên di pirtûka Ksenefones de derbas dibin, iro jî di nav gelê kurd de hene.

Dîsa di pirtûka navborî de li ser çand û dab û nêritên kurdan jî agahî hene. Her wiha di pirtûkê de li ser dîlanên kurdan jî hin agahî cih digirin. Nivîskar dibêje taybetiya reqsên kurdan a herî berbiçav ev in: Kurd bi du an jî çar kesan govendê na gerînin. Gelek mirov dikevin milên hev û li gorî muzîkê direqisin. Lî pir giran dilizîn. Tiştekî balkêş e di reqsê de jin û mîr bi hev re dilizîn û mîrên kurd ji

Major Frederick MILLINGEN




vê yekê aciz nabin. Lî diyar e Milingen tenê govenda herêmekê dîtiye. Bi qasî ku tê zanîn dîlanên kurdan bi gişî bi lebat û lez in.

Pirtûk digel gelek kîmasiyan jî hêja-yî xwendinê ye. Bi taybetî jî ji bo mirovên ku dixwazin li ser jiyana kurdan a 200 sal berî niha bibin xwedî agahî, ev berhem balkêş e.

SERWÎSA ÇANDÊ

OSMAN ÖZÇELİK



Nivîskarê me ji  
ber pîrbûna kar û  
barêن xwe yên  
siyasî nekarî  
nivîsa xwe  
binivisîne.

## Sersaxî

Apê Xwedîyê Rojnameya Azadiya Welat M. Nuri Karakoyun birêz Şükrû Karakoyun koça xwe ya dawî kir. Em dibêjin dilovaniya Xwedê lê be û serê malbata wî sax be.

## XEBATKARÊN AZADIYA WELAT

### Nurettin Karacadağ koça xwe ya dawî kir

Rewşenbîrê hêja Nurettin Karacadağ cû ber dilovaniya Yezdan. Her wekî wî bi xwe jî digot: “Ga dimire çerm dimîne, mirov dimire nav dimîne.” Birêz Nurettin Karacadağ jî bi helwest û xebata xwe navê xwe di dîroka rewşenbîriya kurdî de nemir kir. Em dibêjin bila serê malbata wî û gelê kurd sax be.



NURETTİN  
KARACADAĞ

ROJNAMEYA AZADIYA WELAT  
ÎNSTİTUYA KURDİ YA STENBOLÊ

# Emê Spagettî bixwin!.. Lîret heye?..

Piştî derketina Serokatiyê ya Ewrû payê, tirkên nijadperest li hemberî Italyayê helwesteke tund û hov girt. Li hemberî vê yekê ji ber ku reaksiyona gelê kurd rastî êrîşen tund ên re-jîmî hatin, lê gel dîsa ji helwesta xwe diyar kir, tevî vê yekê gel bi awayekî henekî helwesta xwe diyar dike.

Niha li Qoserê çend heb qerf, di nav gel de têne vegotin. Kesênu ku di ber di-

kanêñ Markfiroş û Dolarfiroş re derbas dibin, ji qestîn dibegin: "Lîret heye?" Qerfa din ji li ser makarna ye. Gelek kesênu ku ji makarnayê hez nakin, dibegin: "Ji niha û pê ve em ê spagettî bixwin!"

Ev bûyer û qewimîn çiqas tijî ês bin ji, wekî trajediye roj bi roj diqewimin. Li hêlekê govenda evîndarê agir, li hêla din çalakî û qerfîn dîrokî; lê ne tra-

jediyeke kirêt, trajediye bingeha rojên xweş.

Yaqûp Tilêmenî/ Qoser/Mêrdîn

## Remezan

Mirovek gava diçe xebatê ji jina xwe re dibêje:

-Jinik van xwarinan tev berhev bike di meha remezanê de bide feqîran.

Mirovek di ber deriyê malê re derbas dice, dibêje:

-Xwişkê ji xêra xwe re tasek av bide min, ez tî bûme.

Jinik dipirse:

-Xalo navê te bi xêr.

Zilam dibêje: Navê Remezan e.

Jinik gava vê yekê dibihîze, xwarina ku bo rojiya Remezanê berhev kiriye gişkan dide mîrik.

Dibe êvar, mîrê jinikê tê malê û dibêje: "Jinik te ew xwarin ci pê kir?"

Jinik jî bi awayekî jixwebawer dibêje: "Mîrik Remezan hat û min jî xwarin giş da wî." Îcar mîrik dibêje: "Keçê min got di meha Remezanê de li feqîran belav bike. Min negot bide Remezan." Jinik jî dibêje: "Mîrik li min negire, min

got ka te gotiye di meha feqîran de bide Remezanan."

Memed/Müs

## Tirkî axaftina Elo

Berî destpêka têkoşînê dewleta tîrî gelê kurd kiribû rewseke wisa ku piranîya kurdan ji kurdbûna xwe şerm dikir tî dixwest bibin tîrî. Ji bo vê yekî tikitîya wan gelek caran tiştîn nebaş diarı serê wan.

Yek ji wan kesan jî Elo bû. Elo pişî çend salênu ku li metropolên Tirkîye dixebe û vedigere mala xwe. Di malî de bi jina xwe re bi kurdî xeber nadî. Her tim qaşo bi jina xwe re bi tîrî xeber dide. Rojekê Elo gelek birçî dibe û dixwaze jina wî jê re nam bîne. Elo bang li jina xwe dike, dibêje: "Qız Fato, Fato, getir o sêni. leyânî, em bixwin wî nani." Fato jî qaşo mîrê wê bi kurdî naxive, wiha bersiv dide: "Ez birîm ser wî zi manê ku ew tîrîya te ji min re anî!"

BERHEKAR: DAVUT/WAN



## BI XELAT...

## XACEPIRSA BI XELAT (150 )

## XACEPIRSA

Sorular	Hizmetler	İş Birimi	Cihânet	Çalışma	Güven	Tipik	Naveki	Tâzhe
Nâz	F	B	Cihânet	+	K	T	+	
TAWAN	D	D	+		R	A	V	
TEKÜZ	2	R	+		I	H	A	
EM	S	J	R	E	Z	A	N	
AKJİN	T	D	+		T	D	A	
DÖN	N	N	A	V	E	S	P	
ZEKEM	B	N	E	H				
NGYİN	T							
DERDİN	R							
PEYVA VESARI								



### Bersiva Xacepirsa 148'an

Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigîhêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 150'yi Kaseta Mihemed Şêxo 'Nesrin'e.

#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Vesari" di nava qutiyêni li bin xacepirse de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînî.

mihemed Şêxo

nesrin



3

Penc kesênu ku xelata 148'an Pirtûka 'Liceli Delikanlı' qezenç kirine ev in: Hüseyin Taşdemir/ Stenbol, Nazım Erdoğan/Semsür, Hakan Danış/ Edene, M. Zeki Karaca/ Stenbol,

Cüreyekî dibistanê Nûnereki ERNK'ê	↓	Keser kişandan Rojekî	↓	Naveki jinan Érişkar, quduz	↓	Lehi	↓	Tipeke kurdî Sembola nikel e	↓	Ardê siti-randi
5				3						Kesê yalaka
Ango	→			Bi farisi av	→			Bajareki kurdistan e (li rojhilat)		
Eyd	↓			Stranek						
		Pirsgirêk	↓							
		Dengdarê n reb								
Cihê em li ser dijin Bî kirdki heval	→		↓		Tipa dû k'yê Çiya, yayla	→		Ne tarî Pereyê kuweyt e berepaşkî	→	
					Tipa dû q'yê Çeng, dal	→		Herêmek Kurdan Bî awayekî din tune	→	
Sembola iyot e Dengdéra 'min'	→	İd Eraqek	→	4						
2		Rêberî Paşdaçek	↓							
Roja çuyi Pusu	↓	1			Nalin Tipa dû i'yê	→				
								Senbola renyümê	→	



PEYVA VEŞARI



1. 2. 3. 4. 5

# Derheqê Kîrmâncî de Kombiyayışê Pancine IV

soru ..... pers (n)  
 soru cümlesi ..... hevokê persî (m)  
 soru işaretî ..... nîşanê persî (n)  
 soru sıfatı ..... sifetê persî (n)  
 soru zamiri ..... zemîrê persî (n)  
 soru zarfi ..... zerafa persî (m)  
 sıfat ..... sifet (n)  
 sıfat tamlaması ..... izafeya sifeti (m)  
 sözcük ..... çeku (n)  
 sözlük ..... ferheng (n)  
 şahıs zamiri ..... zemîrê kesî (n)  
 şart kipi ..... raweya şartî (m)  
 şimdiki zaman ..... demo nikayın (n)  
 şimdiki zamanın hikayesi ..... demo viyarteyo niyayin (n)  
 taki ..... suffiks (n)  
 tamlama ..... izafe (m)  
 tekil ..... yewhûmar  
 tekil ad ..... nameyo yewhûmar (n)  
 tekil isim ..... nameyo yewhûmar (n)  
 terim ..... term (n)  
 tümce ..... cümle (m)  
 tümleç ..... temamker (n)  
 türemiş ..... viraşte (n), viraştiye (m)  
 türemiş fil ..... karo viraşte (n)  
 türemiş kelime ..... çekuyo viraşte (n)  
 ünlem ..... intereksyon  
 ünlü ..... vengin, e  
 ünlü harf ..... herfa vengine (m)  
 ünsüz ..... bêveng, e  
 ünsüz harf ..... herfa bêvenge (m)  
 vurgu ..... aksan (n), ton (n)  
 yakın sanal geçmiş zaman ..... demo viyarteyo niyetin o nezdî (n)  
 yalnız ..... xoser, e  
 yalnız ad ..... nameyo xoser (n)  
 yalnız isim ..... nameyo xoser (n)  
 yapabilmek ..... şayene (şayış), eşkayene  
 (eskayış),  
 yardımçı ..... ardimkerdox, e  
 yardımçı fil ..... karo ardimkerdox (n)  
 yer zarfi ..... zerafa cayî (m)  
 yüklem ..... kardar (n)  
 yön bildiren zarf ..... zerafa hetî (m)  
 zaman ..... dem (n)  
 zaman zarfi ..... zerafa demî (m)  
 zamir ..... zemîr (n)  
 zarf ..... zerde (m)  
 zarsalı sayilar ..... hûnarnameyê zerfki  
 zincirleme tamlama ..... izafeya rêsilkî (m)

## 8) TERMÊ LEŞKERÎ



tırkı ..... kîrmâncî (zazakî)  
 akım ..... hêriş (n), gale (m), galim  
 akın etmek ..... hêriş kerdene,  
 gala...kerdene, galim kerdene, galime pira nayene  
 alarm ..... alarm (n)  
 alarm çalmak ..... alarm cenayene  
 alay ..... alaye (m)  
 alman (tüfek) ..... aleman (n)  
 antitank ..... antitanq (n)

antreman ..... antreman (n)  
 asayış ..... asayış (n)  
 asker ..... leşker, e  
 askeri ..... leşkerî  
 askeri bütçe ..... bütçeya leşkerî (m)  
 askeri cip ..... cipa leşkerî (m)  
 askeri hizmet ..... xizmeto leşkerî (n)  
 espar, e; suwar, e; suvarî (n), suvariye (m)  
 atom ..... atome (m)  
 atom bombası ..... bombaya atomê (m)  
 barut ..... barut(n)  
 barut hakkı ..... heqê barutî (n)  
 batarya ..... batarya (m)  
 bayrak ..... beyraqe (m), ala (m)  
 bazuka ..... bazûka (m)  
 beşli (tüfek) ..... bêşli (n)  
 bomba ..... bomba (m)  
 bomba atmak ..... bomba eştenne  
 bomba koymak ..... bomba dekerdene  
 bomba patlatmak ..... bomba teqnayene  
 bombalamak ..... bomba kerdene  
 bombardanmak ..... bomba bîyene  
 bombardıman ..... bombarduman  
 bombardıman edilmek ..... bombarduman bîyene  
 bombardıman etmek ..... bombarduman kerdene  
 bot ..... bote (m)  
 bütçe ..... bütçe (m)  
 cemse ..... cemse (m)  
 cephe ..... cebilxane (n)  
 cip ..... cîpe (m)  
 çare ..... çare (n)  
 çaresiz ..... bêçare  
 darbe ..... çewr (n), derbe (m)  
 darb yarası ..... birfîna çewrî (m), birfîna  
 derbe (m)  
 denizaltı ..... bota binawe (m)  
 derman ..... derman (n)  
 dermansız ..... bêderman, e  
 düzenli ..... biserûber, e; intîzamin, e,  
 nîzamin, e  
 düzensiz ..... bêserûber, e; bêintîzam, e;  
 bênízam, e  
 egemenlik ..... bandure (m)  
 hakimiyet ..... bandure (m)  
 emniyet ..... asayış (n)  
 el bombası ..... bombaya destî (m)  
 genel ..... pêroyî  
 genel asayış ..... asayışo pêroyî (n)  
 genel emniyet ..... asayışo pêroyî (n)  
 genel güvenlik ..... asayışo pêroyî (n)  
 güvenlik ..... asayış (n)  
 hazır ol! (emir) ..... amade be!  
 hidrejen ..... hidrojene (m)  
 hidrojen bombası ..... bombaye hidrojene (m)  
 hizmet ..... xizmet (n)  
 hücum ..... hêriş (n), gale (m), galim  
 hücum etmek ..... hêriş kerdene, gala ...kerdene,  
 galim kerdene, galima pira nayene, ramitene ser  
 idman ..... idman (n)  
 ikaz ..... balansı (n), iqaż (n)

ikaz etme ..... balansı, pêhesnayış, iqażkerdiş  
 ikaz etmek ..... bal antene, iqaż kerdene  
 intizamlı ..... biserûber, e; intîzamin, e, nîzamin, e  
 intizamsız ..... bêserûber, e; bêintîzam, e, nîzamin, e  
 jandarma ..... cendirme (n)  
 kanat ..... bask (n), perr (n), pol (n)  
 sağ kanat ..... basko rast(n), perro rast(n), polo rast(n)  
 sol kanat ..... basko çep(n), perr çep(n), polo çep(n)  
 kara ..... erd (n), bej (n)  
 karar ..... bire (m), qerar (n)  
 karar almak ..... bire girewtene, qerar girewtene  
 karar vermek ..... bire dayene, qerar dayene  
 karara bağlamak ..... bire dayene, qerar dayene  
 karargah ..... qerargehe (m)  
 karasal ..... erdi, beji  
 kol ..... bask (n), perr (n), pol (n)  
 sağ kol ..... basko rast(n), perro rast(n), polo rast(n)  
 sol kol ..... basko çep(n), perro çep(n), polo çep(n)  
 mekan ..... ca (n), mekan (n)  
 muhafiz alayı ..... alaya muhafizi (m)  
 nîzamlı ..... biserûber, e; nîzamin, e; intîzamin, e  
 nîzamsız ..... bêserûber, e; bênízam, e; bêintîzam, e  
 poligon ..... cayê çekeştişî (n), poligon (n)  
 rahat ..... asan, e  
 rahat! (emir) ..... rehet!  
 sax taraf ..... heto rast(n), perro rast(n), polo rast(n)  
 saldır ..... hêriş(n) gale (m), galim  
 saldırmak ..... hêriş kerdene, gala ...kerdene, galim kerdene,  
 galime piranayene, ramitene ser  
 silah ..... çeka(m)  
 silah atış yeri ..... cayê çekeştişî (n), poligon (n)  
 silahlı ..... çekdar  
 silahsız ..... bêçek, e  
 strateji ..... strateji (m)  
 strateijik ..... stratejik, e  
 stratejik yer ..... cayo stratejik (n)  
 sürgü (silah sürgüsü) ..... surme (n)  
 ..... espar, e; suvarî(n), suvariye (m)  
 şehit ..... şehid, e  
 şehit düşmek ..... şehid bîyene  
 şehit olmak ..... şehid bîyene  
 takтик ..... taktik (n)  
 taraf ..... het (n), perr (n), pol (n)  
 uyarı ..... balansı (n), iqaż (n)  
 uyarma ..... balansı, pêhesnayış, iqaż-  
 erdiş  
 uyarmak ..... bal antene, iqaż kerdene  
 yara ..... birfîne (m), dirbete (m)  
 yaralı ..... birîndar, e; dirbete, e  
 yer ..... ca (n)  
 (Qediya)

Îro % 90'ê zarokên li kolanan dijîn kurd in.

Sedema vê yekê ya bingehîn jî şerê ku li Kurdistanê didome ye. Gün bi kurtayî li ser dîroka pirsgirêkên zarokan sekinî. Bi piranî jî li ser pirsgirêkên ku di Sedsala Bîstemîn de di civaka kapitalist de rû dane rawestiya û da zanîn ku li her dera cîhanê mafêñ zarokan têne binpêkirin û sermayeya kapitalist jî bo berjewendiyêñ xwe bextê roja zarokan reş dikan.



**Li Îzmîrê li ser lêqewmiyêñ şer; zarokan, panel hate lidarxistin:**

# Şer u Zarokên Kolanan

**R**oja 5'ê berfanbarê li NÇM'ya Îzmîrê li ser şer û zarokên kolanan panelek hate lidarxistin. Endamê Komeleya Parastina Zarokên Kolanan Zübeyit Gün panel pêşkêş kir.

Zübeyit Gün di detspêka ahaftina xwe de got ku îro li Kurdisan û hemî de verên cîhanê bedela hemî pirsgirêkan zarok didin. Hewce ye ku em di vî warî de saziyên alternatif ava bikin. Lewre îro % 90'ê zarokên ku li kolanan dijîn kurd in. Sedema vê yekê ya bingehîn jî şerê ku li Kurdistanê didome ye. Gün bi kurtayî li ser dîroka pirsgirêkên zarokan sekinî. Bi piranî jî li ser pirsgirêkên ku di Sedsala Bîstemîn de di civaka kapitalist de rû dane rawestiya û da zanîn ku li her derê cîhanê mafêñ zarokan têne binpêkirin û sermayeya kapitalist jî bo berjewendiyêñ xwe bextê zarokan reş dike.

Her wiha wî bal kişande ser şerîn ku di van deh salêñ dawîn de rû dane û diyar kir ku di van şeran de du milyon zarokan jiyana xwe ji dest daye, 5 milyon zarok seqet mane û 12 milyon zarok bêcîh û war mane. Her wiha derûniya deh

milyon zarokan xera bûye, milyonek zarok sêwî mane; li 25 welatan bi hezaran zarok ketîne nava şer. Dîsa bi milyonan zarok her çiqas ne di nava şer de bin jî, ji texribata şer para xwe standine û ketîne rîwsa xizanî, koçberî û nexweşiyê.

Zübeyit Gün li ser psikolojiya zarokên ku di bin tesîra şer de mane jî, rawestiya û gotina xwe wiha domand: "Jiyana zarokên ku koçberî welatîn xerîb bûne serobînî hev dibe. Ew hê di zarokatiya xwe de dest bi xebatê dikan. Karêñ wekî boyaxkîna solan, firoşkeriya seyar zarokan derdi-

xin kolanan. Her wiha zarok di şer de beramberî işkence, suhurandin (tecawiz) dimînin. Carna ji bo ku hin tiştan li zarokan bidin ferkirin, carna bo hilanîna tola xwe, carna jî ji bo kîfa xwe işkenciyê li zarokan dikan. İşkence û suhurandin li ser derûniya zarokan texribatê

pir mezin pêk tînin û zarok vê yekê heta hetayê ji bîr nakin."

Gün li ser encama şerê ku dewleta tirk li dijî gelê kurd dijomîne jî rawestiya û da zanîn ku di vî şerî de bi sedan zarok mirine, bi hezaran koçber bûne. Zarokên kurd îro li ser sergoyê nîn berhev dikan. Gün got: "Zarok li serê riyan bombevîn ku ji aliyê leşkeren tirk ve hatine avêtin dibînin û pê dilizîn. Gelek caran ev bombe di destê wan de diteqin û dibin sedema mirana wan."

Zübeyit Gün li ser zarokên kolanan jî wiha got: "Ev tiştîn ku me li jor gotin tev sedemîn ketîna zarokan a kuçeyan e. Îro ji sedî nodê zarokên ku li kolânîn Îzmîrê dimînin zarokên kurdan in Ev zarok di destpêkê de ji bo ku bixebeitin û diravan bidin malbatêñ xwe li kolanan solan boyax dikan, firoşkeriya seyar di-

kin. Zabita didin pey wan û hacetê wan ji destê wan digirin. Pişre dema ku zarok diçin mal ji bavêñ xwe kutanê dixwîn. Lewre jî zarok ji mal direvin û li kolanan dimînin. Paşê tîner û balyî dikişînin."

Zübeyit Gün ji dê û bavêñ zarok xwest ku hezkirina xwe ji wan kêm nekin û nehêlin ku zarokên wan bikevi kolanan. Her wiha Gün kes û saziyî demokratik jî rexne kîrin û got divê ser mijara navborî hûr bibin. Ji ber ka hejmara zarokên kolanan ne kêm e û pîraniya wan jî zarokên kurd in

Li hemberî pirsa bi rengê; zarok çimî li Dadgehêñ Ewlekarîyê yên Dewlet (DGM) têne darizandin? Gün wiha got: "Wekî tê zanîn dewleta tirk Peyman Mafêñ Zarokan a Neteweyen Yekbûy şanenav kiriye. Lî ji ber ku li Kurdisan şer tê meşandin dewlet vê peymanî binpê dike. Her wiha li Tirkîyeyê zagona zarokan heye lê ev jî ji ber şerî navborî avêtine quncikekî. Îro li Tirkîyeyê zarok di Dadgehêñ Ewlekarîya Dewlet de têne darizandin. Nêzîki 300 zarok cezayê daliqandinê girtiye."

DAVUT ÖZALP / A. WELAT / İZMİR

**Karêñ wekî boyaxkîna solan, firoşkeriya seyar zarokan derdixin kolanan. Her wiha zarok di şer de beramberî işkence, suhurandin (tecawiz), fûhûşê dimînin.**